# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ SAL:1 HEJMAR:6 25 BERFANBAR 1994 BUHA:25.000 TL(KDVD)



**Ez xerîbê welata me** Min bêrî kir nanê sêlê, firavîna li ber palê, şevbêrka me derbas dibû, bi çîroka pîr û kalê.

# Z

Rûpel 13

## GELÊN NEGIHÎŞTÎ...

Eger em wêneyê hişên kurdî têxin bin hûrbîneke rewşenbîrî, emê bibînin ku Osman Sebrî ne tenê xebatkar, torevanakî dilêr û mêrxas bû, lê belê ramangirekî bi serê xwe û azaser bû jî.

Rûpel 7

## EDENE BÛYE WEK BAJARÊ KURDISTANÊ

Kurdên ku xaniyên wan, gundên wan, pez û malên wan, zar û zêçên wan hatine şewitandin, ketine ser riya Edenê, Mersînê û hin bajarên din ên Enedolê.Vê potansiyela dînamîk li Çukurovayê jiyaneke nû şanî kurdên ku ji zû ve hatine wan bajaran, da. gelek xebat û serhildan pêk anîn."

Rûpel 16

# KURDÊN ŞÊXBIZINÎ LI BER XWE DIDIN

- Şêxbizinî êleke kurd a pir mezin e. Di pêvajoya sê sed salên dawî de ji ber zilm û zora îdareyên zilimkar gelek cih guhertine, koçber bûne, ji hev hatine belavkirin. Lê tevî vê yekê, hev bernedane, dev bi ziman, çand û edetên xwe yên kurdîtiyê ve girêdayî mane.

- Asîmîlasyona ku dewleta tirk ji berê ve li ser wan pêk aniye, îro bi awayên din be jî, didome. Li ser rewşa dawî ya van kurdên sitembar me bi mamosteyekî Şêxbizinî, Hemdî Dêllê re xeber da.

- Şêxbizinî, devokek ji soranî bi kar tînin. Ew wekî zaravayê soranî ye. Li gorî bikaranîna dem û lêkeran (fiêlan) lehçeya me wekî soranî ye. Lê ev, car caran wekî "Erdelanî" ye jî.

Rûpel 8–9

**Ji sazûmankarên TOHAV'ê (Weqfa Hiqûq û Lêgerînê ya Civakî) Ebûqat Eren Keskin:**

# EWRÛPA DUBENDIYÊ DIXE NAVA KURDAN

- Li gorî min dewleta tirk ewil li hemberî kurdan zor bi kar aniye. Kurdan ne bi PKK'ê ve dest bi vî şerî kirine. Ji dewra Şêx Seîd û bi vir ve ev têkoşîn heye. Di vê zorê de sûcê mezin yê dewletên Ewrûpî ye. Ji ber ku Tirkiye bi alîkariya wan vî şerê qirêj didomîne. Heqê Ewrûpa tune kurda û PKK'ê ji hev veqetîne. Ewrûpî zora PKK'ê bi kar tîne wek ya dewletê dinirxînin.

Rûpel 2



## JI ROJEVÊ

## KURD, HIQÛQ Û DÎPLOMASÎ

**Kurd, hin tiştan hê nû keşf dikin: Dîplomasî. Lê dîplomasî jî di xwe de gelek tiştan dihundirîne, wek mînak dîplomasiyeke bê alîkariya hiqûqê, nayê fikirîn. Ebûqat Eren Keskin, li ser nêrîna Tirkiyeyê ya hiqûqê vê dibêje, "Tirkiye, gava qanûneke navneteweyî îmze dike, li gorî rewşa kurdan qismekî peymanê îmze dike. Êdî tê zanîn ku hikûmetên Ewrûpî, dîtinên van rêxistinan ji bo rastkirina siyaseta xwe, wek çavkanî dinirxînin. Eren Keskin, li ser vê meseleyê dibêje, "Êdî li Ewrûpa herkes, di şerê Kurdistanê de PKK'ê û dewletê wek du terefan dibînin. Rêxistina Efûyê jî di vê dîtinê de ye. Lê li hemberî kurdên ku şer dikin, ev rêxistin bi şuphe hereket dike. Lazim e tevgera kurd têkiliyên xwe bi saziyên serbixwe re deyne û qala niyeta xwe ya çareserkirina siyasî bike û wan îkna bike." Encama vê gotinê ev e; lazim e kurd ji aliyê hiqûqê ve wezîfeyên xwe bînin cih. Hiqûq, dîplomasî bi xwe ye.**

Ji sazûmankarên TOHAV'ê (Weqfa Hiqûq û Lêgerînê ya Civakî) Ebûqat Eren Keskin beşdarî civîna Rêxistina Efûyê bû:

# EWRÛPA DUBENDIYÊ DIXE NAVA KURDAN



Ebûqat Eren Keskin di herdu mehên dawî de sê car beşdarî civînên navneteweyî bû.

Ebûqat Eren Keskin, di civînên Rêxistinên Efûyê de got ku dewleta tirk, li Kurdistanê 'hiqûqa şer' çêkiriye. Ebûqat Ew di nav meha berfanbarê de beşdarî gelek civînên Rêxistina Efû ya Navneteweyî bû. Ji van civînan ya herî dawîn di 15-16'ê berfanbarê de li Almanyayê li bajarê Kölnê çêbû. Li vê civîna ku babeta wê "Hiqûqa Mêtingehkar" bû, Keskin, li ser hiqûqa komara Tirkiyeyê ya ku 70 sal e (Qanûna Dêrsimê, Mehkemeyên Îstiklalê û Qanûna Herêma Rêveberiya Awarte 'Olağanüstü hal bölgesi') li hemberî kurdan bi awayekî cihê bikartîne, peyivî. Di van civînan de ji rêxistinên serbixwe û ji partiyên Almanyayê nûner û gelek kesên bi vê meseleyê eleqedar, beşdar bûn.

**HIQÛQA ŞER**

Eren Keskingote ku, şerê ku dewleta tirk li hemberî kurdan dimeşîne li gorî qanûnên Tirkiyeyê ye. Keskin meseleyê wiha dinirxîne: "Berpirsiyarên hikûmetê jî di nav de serokwezîr Tansu Çiller gava dibêje,' dewlet li gorî qanûnan hereket dike,' rast dibêje. Ji ber ku qanûnên Tirkiyeyê li gorî 'hiqûqa şer' hatine hazirkirin. Wek mînak rayedarên hikûmetê îdîa dikin ku ewê di nêzîk de, qanûna 'antî terorê' biguherînin û ji fikrê re serbestiyê bînin. Dinya jî bi van gotinan dixapin. Lê tiştekî ji bîr dikin ku guherandina qanûna 'antî terorê' ji bo Herêma Rêveberiya Awarte (Kurdistanê) tu tiştî ifade nake. Li wê herêmê gund têne şewitandin, ev tişt di qanûna wan de (Qanûna Herêma Awarte benda 4'an) heye însan têne nefîkirin û kuştin, ev giş li gorî wan qanûnan e. Jixwe qanûna vê herêmê, ne li gorî Peymanên Navneteweyî yên ku Tirkiyeyê îmzekirin in."

> **"Berpirsiyarên hikûmetê jî di nav de serokwezîr Tansu Çiller gava dibêje,' dewlet li gorî qanûnan hereket dike,' rast dibêje. Ji ber ku qanûnên Tirkiyeyê li gorî 'hiqûqa şer' hatine hazirkirin."**

**SÛCÊ MEZIN YA EWRÛPA YE**

Eren Keskin, li ser tewra Ewrûpiyan û bi taybetî jî li ser tewra Rêxistina Efûyê a li ser kurdan ev got,"Ew kurdan bi du şiklan vediqetînin; kurdên li dijî şîdetê derdikevin û yên ku şîdetê bikartînin. Şîdeta ku PKK bi kar tîne wek ya dewletê dinirxînin. Min di axaftina xwe de ev dîtina wan rexne kir û got ku tu heqê wan tuneye ku ew kurdan bi vî awayî ji hev veqetînin. Li gorî min dewleta tirk ewil li hemberî kurdan zor bikar aniye. Kurdan, ne bi PKK'ê dest bi vî şerî kirine, lê belê ji dewra Şêx Seîd û bi vir de ev têkoşîn heye. Di vê zorê de sûcê mezin jî yê dewletê Ewrûpî ne, ji ber ku Tirkiye bi alîkariya wan vî şerî dewam dike. Li ser beyankirina van fikrên min hinekan ji wan pirsîn ku ez terefdarê şîdetê me an na. Bersiva min jî na bû."

Li gorî Keskin, dewleta tirk, raya giştî ya Ewrûpa û hikûmetê van dewletan bi hatina Îslamê ditirsîne. Ewrûpî jî, ji vê yekê kêmzêde bawer dikin. Ebûqat Keskin dibêje, " Li gorî Ewrûpiyan, Tirkiye dewleteke laîk û hêdî hêdî ber bi modernîzmê diçe û lazim e ew, Tirkiyeyê di vê pêşveçûnê de destek bikin. Yanî ew zû bi zû naxwazin dev ji Tirkiyeyê berdin."

Keskin, got ku yên ev fikr pêşkêş kirin, "ji Partiya Sosyal Demokratên Almanan bûn. Li hemberî van îdîayan Keskin fikrên xwe wiha tîne zimên, "Li Tirkiyeyê dewlet ne laîk e, çimkî saziya Karûbarê Diyanetê heye û ev sazî bi pereyên dewletê îdareya xwe dike. Ev dek û dolabên dewleta tirk ne nû ne û ji bo xapandina raya giştî ya Ewrûpa ye."

**DÎPLOMASÎ GIRÎNG E**

Keskin, ji aliyê hiqûqa navneteweyî ve li hemberî van propagandayên dewletê ev pêşniyar kirin, "Ev gotinên min ne wek aqildanekê ne, lê lazim e hin tişt bêne fêmkirin ku îdîayên siyaseta dewleta tirk di warê dîplomasiyê de li hemberî tevgera kurd diajo, bêbingeh in. Di vê hêlê de bersiva kurdan jî lazim e dîplomatîk be. Ji ber ku destên kurdan di vê hêlê de negirêdayî ne. Xaça Sor û Komisyona Şer ya Cenewreyê bi tenê hinek ji van in."

WELATÊ ME

www.arsivakurd.org

# Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê şaxê Bonnê

# Yekta Uzunoğlu bi sûcê ajantiyê hate girtin

Roja 18.9.1994'an li Pragê Serokê Enstîtuya Kurdî li Bonnê (hate rûxandin) bi sûcên giran hate girtin.

Di bin navê bazirganiyê de, piştî rûxandina Enstîtuya Kurdî li Bonnê, ku şaxekî Enstîtuya Kurdî ya li Parîsê bû, diçe li Pragê paytexta Çekoslovakyaya berê çend fîrmayên ticaretê vedike. Bi navê wan fîrmayan gelek têkiliyên tarî bi berpirsiyarên konsolosxa Tirkiyê re jî datîne. Li gorî rojname û kovarên Çekî Yekta ajanekî Tirkiyê bûye, ne ji bo ticaretê, ew ji bo karekî veşartî, bi talîmatên konsolosa Tirkiyê li Pragê bûye xwediyê fîrmayên bazirganiyê.


LIDOVÉ NOVINY
Významný turecký obchodník ve vazbě
PRÁVO
Klaus o něm ... nevěděl

Rojnameyên biyan jî, li ser îdiaya ajantiya Uzunoğlu bi firehî sekinî.

Li ser girtina Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê şaxê Bonnê, Rojnameya Dens (Îro) roja 30.11.1994 wiha dinivîsîne: "Bi sûcê girtin, dizîn, kuştin û revandina însanan, tacirê tirk (bi eslê xwe kurd e) Yekta, ku ev demeke direj e têkiliyên wî bi berpirsiyarên dewletê re hene, hate girtin. Yekta, gelek têkiliyên veşartî di navbera hikûmeta Tirkiyê û ya Çekî de jî çêkirine..."

Rojnameya LidovéNoviny (Gel) jî di eynî rojê de dinivîsîne: "Bi sûcêdanîna du planên kuştinê û sextekariyê tacirê tirk Yekta Uzunoğlu roja 18.9.1994 hate girtin. Li gorî dozgerê dadgehê têkiliyên Yekta bi berpirsiyarên Çekî re hebûne û gelek hevdîtinên dizî bi berpirsiyarên dewleta tirk re çêkirine ji bo danîna têkiliyan di navbera herdu dewletan de..."

Xwediyê fîrmaya Mîrîdyan Yekta bi milyonan dolarên sexte çêkirine, her wiha di ticareta eroînê de jî li Çekê destekî wî hebûye. Berpirsiyarên emniyetê wî bi xurtî diparêzin. Li gorî giraniya sûcan, Yekta wê 15 salan rakeve. Ebûqatê sûçdar pêşniyar kiriye ku wî bi kefaletê berdin, lê hema dadgehê ev pêşniyar nepejirandiye..."

Rojnameya Rudé Pravo (Rastiya Sor) jî dinivîsîne: "Sûcdar 4 sal in li vê derê ye, têkiliya wî bi sefareta Tirkiyê re xurt e. Diyar e ku xizmeteke mezin ji sefaretê re dike. Berpirsiyarên sefaretê wî diparêzin."

Weke tê zanîn Yekta Uzunoğlu ji aliyê malbatî ve gelekî nêzîkî Kendal Nezan e. Kendal Nezan di dema damezirandina şaxê Enstîtuya Parîsê de li Bonnê ew kiribû serokê şaxa Enstîtuyê.

**Prag/Welatê Me**

# Saziyeke Aştîxwaz: Akademiya çanda cîhanê

Endamên Akademiya Çandê ya Cîhanê civîna xwe ya 5'an li Parîsê li dar xist. Di civîna 20'ê berfanbarê de ku li Salona Richelieoyê ya Muzeya Louresê pêk hat, endam li ser mijara "Cihanî Cîgehî" rawestiyan.

Akademiya Çandê ya Cîhanê di 29.1.1 993'yan de bi beşdariya 42 endamên hîmdar li Parîsê civîna xwe ya pêşîn çêkiribûn. Di nava wan kesan de rewşenbîr, hunermend, ramangir, nivîskar û û wêjevanên navdar hene.

Romannivîsê navdar Yaşar Kemal jî yek ji wan e. Di civîna dawîn de Kemal ji axivî û bal kişand şer hêvotinê (tedrîsatê) û got, "Mirov bi tenê di saya wê de dikarin bigihêjin armancên xwe.

Navê hin endamên hîmdar:

Elie Wiesel (Ramangir û nivîskarê frensî)

Adonis (Helbestvanê Lubnanî)

Yaşar Kemal (Nivîskar û rojnamevan)

Jorge Amado ( Nivîskar,rojnamevan û polîtîkavanê Brezîlî)

Umserto Eco ( Nivîskar û ramangirê Îtalyanî)

Nadine Gordimer ( Nivîskara Afrîkaya Başûr)

Jovier Perez de Cuellar (Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî yê berê)

Federico Fellini (Rejîsorê Îtalyanî)



Sazûmankarekî akademiyê jî Yaşar Kemal e.

**Navenda Nûçeyan**

# Li Amerîkayê çalakiyên li ser çanda kurdî

Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), li bajarê San Francisco'yê, li SF Camerawork'ê roja 9'ê berfanbarê du pêşengehên li ser kurdan vebûn. Ev pêşengeh wê heta 28'ê rêbendana 1995'an vekirî bimînin.

Pêşengeha bi navê, 'Dema Sînor Xwîn bûn: Têkoşîna Kurdan' ji wêneyên li ser çar mijaran pêk hatiye: Koçberî, penaberî, jiyana rojane, polîtîka û şer. Wênekêş, Ed Kashi pirtûkeke jî bi eynî navî nivisiye, pirtûk bi taybetî li ser koçberbûna kurdên Başûr e. Pirbûna wêneyên li ser wê mijarê jî balê dikişîne ser xwe.

Pêşangeha din , ji wêneyên ku ji gerokvan, mîsyoner, rojnameger û rêveberên kolonyalîst hatine berhevkirin, pêk hatiye. Susan Meiselase'ê ew wêne ji bo pirtûkeke dokumanter a dîrokî ku wê di sala 1995'an de çap bibe, berhevkirine. Navê, pêşengehê ev e, 'Kurdistan: di nav Siya Dîrokê de'

Dîsa ji 112 panelên ku di Konferansa 28'an a Middle East Studies Association (Komela Lêhûrbûnên Rojilata Navîn) de hate dayîn, du heb li ser kurd û Kurdistanê bûn. Ew konferans di navbera 1922'yê sermaweza 1994'an, li eyaleta Arizonayê, li bajarê Phoenixê li dar ket.

Yek ji van panelan li ser dîrok û siyasetê bû, sernavê panelê, ' Li qonaxa di navbera herdu şeran de (1918–1947) Gelemşeya Kurdî.'

**San Fransisco/Welatê Me**

## KURTENÛÇE

### Di televizyona GAP'ê de kurdî (!)

Hikûmeta kolisyonê, piştî reaksiyona saziyên Ewrûpa, dixwaze hin guherandinan bike. Di serê van guherandinan de efûya mebûsên kurd û "qanûna antîterorê" tê. di nav hikûmetê de munaqeşeyên weşana bi kurdî çêdibin. Ji bo weşana kurdî vê gavê televizyona herêmî ya GAP'ê tê fikirîn. Rayedarên dewletê, dixwazin vê riyê li dij gerîla propaganda xwe bigihînin gelê herêmê (kurdan).

### Ebûqatê Tirkiyeyê yê Ewrûpayê îstifa kir

Ebûqatê Tirkiyeyê yê Mehkemeya Mafên Mirovan li Strasbourgê yê Ewrûpayê Prof. Bakır Çağlar îstifa kir. Li gorî Çağlar, Tirkiye, hemû peymanê navneteweyî îmze dike, lê wezîfeya xwe bi cih nîne. Çağlar, demokrasiya li Tirkiyeyê heye wiha dinirxîne, "Heger Tirkiye dixwaze bikeve nav civaka Ewrûpa, lazim e hiqûqa xwe bike wek a Ewrûpa. Ez êdî şerm ku dikim têkevim daweyên wê."

### Civini Dostanî Kurd le Yunan

Dostanî gelî kurd le welatanî Yunan û Bulgariya û Yuguslavya bo piştîwanî le gelî kurdistan rojî sêşem (13/12/1994) le bajêrî Salenîkî Yunanî û be çawdêrî niwênerayetî ERNK le dewletanî Balkan civînêkiyan saz da. Lem civînê da dostanî gelî kurd piştîwanî xoyan bo têkoşînî rewa (meşrû) î gelî kurd dupat kird ewe, herweha qiseker be nawî ERNK ewe wutî: Êwe be dotayetî kirdintan bo gelî krd, dostayetî xotan deken, leber ewey ke KT dujminî hawbeşî hemûman e.

### Maratona Mustafa Tezşah

Bezayê kurd Mustafa Tezşah, di 21'ê berfanbarê de , ji bo protestokirina kirinên ku li Kurdistanê dibin, ji Hamburgê ber bi Bonnê dest bi maratona revê kir. Maraton wê 2 hefte dewam bike û mesafe 500 km. ye. Tezşah, armanca xwe wiha anî zimên, "Ez daxwaz û qeweta 40 milyon krdî di hundurê xwe de hîs dikim. Ez talîmata serok APO ya ku dibêje 'Vejîn qediya dora serxwebûnê ye' tînim cih."

www.arsivakurd.org

### Navên 10 kesên xelatgirtî

**Salih Kaplan**
**İzmir**

**Abdülkerim Boran**
**İstanbul**

**Welat Kapazan**
**İstanbul**

**Mehmet Aslan**
**Mersin**

**Sadrettin Öncü**
**Mardin**

**Resul Yersiz**
**Manisa**

**Mesut Keskin**
**Mardin**

**Celil Akdoğan**
**Diyarbakır**

**G.M.K.**
**Ankara**

**Aydın Karahan**
**Elazığ**

## DI ÇAPEMENIYA TIRK DE RENGEKÎ CIHÊ: CAN DÜNDAR:

# 'EZ JÎ, JI DEP'Ê ME'

Di nav medya û çapemeniya tirk de peydekirina rojnamevanekî bi şexsiyet û pariyekî objektîf karekî gelek zor e. Lê carina, me şaş jî bihêle, em rastî hin pênivîsên ku destê xwe datînin ser wijdana xwe û dinivîsin, tên. Yek ji wan jî Can Dündar e. Hêviya me ew e ku Dündar wê rûmeta nivîskarî bidomîne. Em nimûneyek ji meqaleyên wî didin. Ji berê ve xûyekî min heye. Kengê ku hin kes hewldidin da ku tiştekî bi min bidin hezkirin an jî nefretkirin, hestên berevajî li min çêdibin.

Xwîna min dikelije ser tiştê ku tê zemkirin (li dij tê axaftin) û ez ji tiştê ku pesnê wî tê dayîn dilsar dibim. Dema ez hîn biçûk bûm, min meraka Dudangayê ku li krêşê ji bo bizdandina me wê bihata dikir û min ew sempatîk didît. Li dibistanê dema mamostayê dersa exlaqê got, "keçik xerab in" min polîgamî ango zewaca bi pir kesan re kifş kir.

Min li fîlmê Gandî temaşe kir, di gel ku ez heyranê Mahatma bûm jî ji ber defkirina fîlm a bi aliyê wî ve, ez bûm alîgirê Cinnah. Seansên nefretê yên tomerî, kampanyayên zemkirinê û ayînên pûtavakirinê min ji xwe direvînin. Hem jî min ber bi aliyê din ve dişînin....

Ji ber vê yekê ez DEP'van im, Di gel ku pir hindik tiştên me yê hevpar hene. Ma ne ew in ku bergîdana (bedel) ramanên xwe didin. Ma ne ew in ku ji daxwaza lînçkirinê ya girseyî re dibin qurban.

Divê em hemû xwe ji pêşdaraziyan xelas bikin û bibin DEP'van. Ebûqatên wan têne kuştin ? Divê em giş bi hev re bibin ebûqatên wan. Madem ku Özgür Ülke tê bombekirin, heke me heta niha ew rojname nexwendibe jî, divê em wê bixwînin û bifiroşin. Fikret Başkaya hat cezakirin? Divê li her derê "Paradigmanin İflası" ango Topavêtina Paradigmayê (navê pirtûka Fikret Başkaya)



**Can Dündar**

bê vegotin... Bi perçiqandinê divê rewşenbîr xurtir bibin... bi qedexekirinê divê berhemên ramyarî bên xwendin... Dema endamên Grup Yorumê (komeke muzîkê ya şoreşger) ketin girtîgehê stranên wan jî divê bikevin ser zimanên mirovan.

Birand, Deniz û Halim ji bo çi ceza xwarine, li her qunçikî ev hesab bê pirsîn. Divê di gel Oral Çalişlar, Doğu Perinçek em jî îmzeya xwe biavêjin nivîs û pirtûkan...

Heta ku hejmara kesên li hundir ji yên li derve bihurî...

Heta ku "hundir" bû derve.

Ez bi xwe li nik partiyên radayî me.

Niha ez li pişt DEP'ê me. Endamê partiyên radayî, muşteriyê weşanên qedexekirî û xwendevanê rojnameyên bombekirî me. Ez nîştecihê gundên şewitandî me.

Çi tiştên ku tên qedexekirin û binpêkirin, kesên ku tên hênçiqandin, zilm lê tê kirin, ez li rex wan im.

Çi kesên ku we şandine bin erdê dilê min bi wan re ye.

Heke tiştê ku we doh ji bo ku hûn hewcedar bûn diparast, îro ji ber ku pêdiviya we pê nemaye hûn ji bîr bikin, hûn karin bibin serokkomar, lê hûn nikarin bibin demokrat.

Bawer bikin hesabdayîna dozgeran a îro, ji hesabdayîna zarokên xwe ya sibe hêsantir e.


### Xelata Xaçepirsê

Her hefte xaçepirsa me wê bixelat be. Di pêvajoya 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê binirxînin. Xelat wê bi usûla qurayê li deh kesan bên belavkirin. Xelata vê heftiyê pirtûka **Mehmed Uzun "Evdalê Zeynikê"** ye. Peyva veşarî ya Xaçepirsa hejmara çaremîn: **Berxwedan Jêrenot:**
Ji kerema xwe re navnîşana (adresa) xwe li ser nameyên xwe binivîsin.




"Evdalê Zeynikê"
**Mehmed Uzun**

## XAÇEPIRSA BIXELAT




PEYVA VEŞARÎ
1 2 3 4 5 6 7

## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 30 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 60 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 120 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê -** Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264-1

**Li Derve -** Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

**NAV Û PAŞNAV** : .............................
**NAVNÎŞAN** : .............................
.............................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel-Fax:** 2491344 - 245 29 91

www.arsivakurdi.org

DIK

## Zîrveya Pan-Amerîkan

Li bajarê Miamiyê bi beşdariya 34 welatên parzemîna Amerîkayê di navbera 8 û 11'ê berfanbarê de zirveyek pêk hat. Ji bilî Kubayê hemû welatên parzemînê beşdar bûn. Zîrve roja 11'ê mehê bi peymanekê kuta bû. Li gorî peymanê wê heta sala 2006'an li ser parzemînê Herêma Bazara Serbest ava bibe. Ji bo vê yekê heta dawiya sedsalê divê gelek pirsgirêkên wan welatan çareser bibin. Li gorî peymanê di warê tenduristî û perwerdehiyê de divê hinek gavên mezin bên avêtin. Mînak, divê heta dawiya sedsalê li ser rûyê parzemînê nezanîna xwendin û nivîsandinê nemîne. Di peymanê de biryara şerê li dijî bertîlxwarinê, dizînê, karên ne ji rê û bazara narkotîkê jî hate stendin.

Pêkanîîna biryarên ku hatine stendin ji aliyê gelek welatên beşdar ve jî wek xeyal tê dîtin. Xizanî, bêkarî nakokî û dubendiyên çînî li qiteya her roj zedetir dibin. Hinek welat êdî nikarin faîza deynê xwe jî bidin.

Li gelek welatên Amerîkayê wek Panama, Kolombiya ûhwd. rayedarên dewletê bi mafya re di têkiliyê de ne bazara tiştên narkotîk dikin. Karên ne ji rê heta qada herî bilind a van dewletan hilkişiye. Wê çawa hukmê peymanê bînin cih?

Dewletên Yekbûyî Yên Amerîkayê (DYA) dixwaze bi vî awayî bazara xwe berfirehtir bike. Hêzên împeryalîst êdî bi van peymanên hevkariyê bazara dinê li hev par ve dikin. Wek Bazara Ewrûpayê, Bazara, Asya-Pasîfîk, NAFTA û hwd. Gel jî li hemberî van tiştan bêdeng namîne.


# Merhametê ji niyeta xwe re dikin sîper

Serokê Médecins Sans Frantiéres (Hekimên Sînor Nenas) Rony Brauman dibêje Ewrûpayî ji bo veşartina niyeta xwe ya politîk, merhemetê ji xwe re dikin sîper.

Rony Brauman, di hevpeyvîna xwe ya ku di Newsweek'a 19'ê berfanbarê derket de ev tişt got; "Merhemet ango dilovanî ne hesteke xirab e. Mirov dema kuştina zarokan, li çol û gundên rûxandî cendekên mirovan dibîne, merhemet tê mirov. Lê ew tenê hesteke xwezahî ye. Dema ew bibe nêrîneke politîk, mirov tim bi vî çavî li bûyeran binere, ev dibe tiştekî zehf hîsî.

Brauman, bal kişand ser vê nêrîna Ewrûpayiyan ya li Cihana Sêyemîn û wiha got; "Tim li Cîhana Sêyemîn bi vî awayî tê nihêrtin, ew wek jêderka tirsê tê dîtin. Xîliya, nifûsa zêde tiştên sosret giş têkilî hev an bihevguherî bi van welatan ve tên girêdan. Ji ber vê yekê dema li Rwandayê 500 hezar kes hatin kuştin, wek felaketeke ji gelek felaketên ku li Afrîkayê diqewimin hate nirxandin, ne wek jenosîdekê. Em tenê ketin nava merhemetê.

Brauman daxuyand ku dema şer dest pê kir, ji ber ku welatê Yugoslavyayê pêşketî bû, pêdivî bi alîkariya însanî nîn bû. Lê Ewrûpiyan daku niyeta xwe ya politîk veşêrin rêxistinên însanî şandine Bosnayê. Rony Brauman got ku rêxistinên alîkariya însanî ne bêteref in. Brauman ev got; "Dema em li Saraybosnayê di bin ablûkayê de bûn, em alîgirê qurbanê bûn, lê dema derbasî herêma Sirbiyan bûn, me pişta qesêb girt. Ez bawer nakim ku alîkariya însanî bi temamî alînegir be."



Rony Brauman

Rony Braumanê ku ev 12 sal in serokatiya rêxistineke alîkariya însanî dike, pê de çû û wiha got; "Em dikarin gaveke din biavêjin û bibêjin xebatên însanî ku Ewrûpayî li Bosnayê dimeşînin, riya veşartina alîkariya ku didin Sirbiyan e. Li Frensayê dîplomat û leşker, Sirbiyên ku di Şerê Cîhanî yê duyemîn de hevkarê wan bûn, hîn jî wek mutefikekî dibînin. Ez wisa difikirim ku Serok Mitterand jî ji bo rêlibergirtina şerên mezin li Balkanê, hebûna Sirbistaneke xurt dixwaze. Dibe ku ev dîtin rast be jî, ji ber ku ev mirovekî zehf berpirsiyar e. Lê ew ji bo ku pêşeroja Balkanê bibîne li neynikeke ku paşerojê nîşan dide dinêre. Ji bo veşartina niyeta xwe ya siyasî çalakiyên însanî bi kar tîne.

**Nûçeyên Derve**



Gelê çeçen Osmanî jî tê de li dijî hemû dagîrkeran şer kiriye.

# Rusya ji Çeçenîstanê zû bi zû venakişe

Hêzên leşkerî yên Rusyayê heftiya berî vê ketin Çeçenistanê. Rayedarên Rusyayê piştî ku dor li paytexta Çeçenistanê, li Grozny'ê girtin ji milisên Çeçen xwestin ku çeke xwe deynin, lê Serokê Çeçenistanê Dzhokhar Dudayev daxuyan ku ewê dest bi şerê gerîlatiyê bikin.

Vê komara biçûk sala 1991'an serxwebûna xwe daxuyandibû. Boris Yeltsin'ê ku piştî têkçûna liberalan çavên xwe berdanê piştgiriya neteweka-ran, diwaze ku bi tevgereke wiha piştgiriya wan bi dest bixe.

Ji bilî vê yekê sedema herî giring a vê tevgerê strajîkbûna cihê vê komarê ye. Heke ew der ji dest Rusyayê biçe, wê riya ku Rusyayê digihîne bahra reş, çavkaniya gaza xwezayî jî ji dest here. Li aliyê din Rusya naxwaze ku ew li komarên din yên kafkas re bibe mînak.

Yeltsin evbiryar da lê karê wî ne hêsan e, ji niha ve hinek komutanên artêşa Rusyayê guh nadin fermana wî. Komarên çiyayî yên wek Daxistan, Înguşistanê û Abhazyayê ji niha ve dest bi piştgiriya Çeçenistanê kirin. Tevî van hemûyan gelê Rusyayê jî şer naxwaze.

**Nûçeyên Derve**

# Sebra reşikan zehf nema

Li Afrîkaya Başûr konferansa ANC'ê (Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê) ya 49'an di navbera 17 û 22'yê berfanbarê de li bajarê Bloemfontein'ê çêbû. Ev konferansa ku di bin parkata "Ji şerê Rizgariyê ber bi Avakiri û Pêşveçûnê ve" li dar ket, bû warê gutûgoyên giring ji bo 300 delgeyên ANC'ya ku di avrêla 1994'an de hate ser kar.

Gelek delegeyan rexne li rayedarên ANC'ê girtin û daxuyandin ku ew di warê dermankirina birînên gelê reşik de destgiran in. Sedema vê destgiraniyê jî wek "tirsa xeyidîna çermspiyan" hate tesbîtbirin.

Sekreterê Giştî yê ANC'ê Cyril Ramaphosa di axaftina xwe de got ku heke ev problemên xwe niha tesbît nekin,di rojên li pêş de nikarin xwe li hemberî astengiyên nû li pê bigirin. Serokê ANC û Serokkomar Nelson Mandela di axaftina xwe de riya ku ANC dişopîne parast û ji reşikan sebir xwest. Gelek delegeyan xwest ku ANC xwe ji tirsa xeyidandina çermspiyan rizgar bike û giraniyê bide ser problemên reşikan. Di dawiya konferansê de Nelson Mandela dîsa wek serokê ANC'ê hate hilbijartin.

**Nûçeyên Derve**




Mandela ji reşikan sebrê dixwaze, lê heta kengê.

www.arsivakurd.org

# FAL

**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Xeyalên ku we li dû xwe dikişkişînin, bala kesên din dikişîne ser we. Belkî ji bo bala xelkê li ser we be, hûn van tiştan dikin. Yanî hûn ji bo xelkê li vê dinyayê ne. Qewet be!

**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Hûn her roj li xwe gazinan dikin û dibêjin ez pir xwarinê dixwim. Gazinê li xwe nekin û hinekî bi nefsa xwe karibin. Gava we xwarin xwar, neynikekê jî dînin hemberî xwe, belkî şîşmanbûna we bê bîra we.

**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Mezheba we pir fireh e, exlaqê we jî xweş e. Lê fikreke we bi xwe tune, çimkî hûn fikrên xwe li gorî yên xelkê saz dikin. Yanî siyaseteke we tuneye. Çare: Xwedê we bistirîne. Amîn.

**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Tirsek di dilê we de heye, lê hûn nikarin wê binav bikin. Hûn zanin di nexweşiyan de zû teşhîskirin, pir muhîm e. Her çiqas hûn tirsê ji xwe re çêdikin jî, dîsa guhên xwe bidin mezinan û xwe nîşanî pîreke ku bi cinan re dipeyive, bidin.

**ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Ji biçûktiya xwe hûn bi delalî rabûne, yek we nebûye dudu. Hûn hînî tembeliyê bûne, lê hûn ne bêçare ne jî. Ji bo çendakî herin devereke xalî–tenha (mesela daristanekê) û bi serê xwe bimînin. Belkî aqilê we bê serê we.

**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Wê vê hefteyê di heyata we de hin tişt bêne guherîn û belkî hûn xwe nas nekin. Deriyekî muhîm dibe ji we re vebe. Heke hûn dixwazin dawiya vî deriyî bibînin, fala xwe taqîb bikin.

**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Vê hefteyê, roja yekşemê ji xwe re veqetînin. Li hemberî televizyona xwe rûnin, yanî tembeliyê bikin. Li hevalên xwe jî negerin, xwe vezelînin û li rehetiya xwe binêrin, heta ku hûn ji xwe aciz bûne.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Heyata we wek lîstikekê ye li ba we. Hûn bi rûyê geş niyeta xwe ya veşartî rê însanan nadin, lê gava firset dikeve destê we, hîç bextê we tune. Ma gunehê we bi însanan nayê?

**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Pirî caran hûn dixwazin derewan li însanan re bikin. Lê bila hûn zanibin ku gava hûn derewan dikin, rûyê we ji fediyan sor dibe. Xwe aciz nekin, kêmasiyeke wiha ne girîng e. Ev hêla we wê lazim bibe, belkî hûn di pêş de bibin entîke.

**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Azadî dermanê dilê we ye. Lê hûn carinan heqê însanên din dikarin îhlal bikin. Lazim e hinek hurmeta we li hemberî azadiya însanên din jî hebe. Vê hefteyê hinekî serê xwe li ser van tiştan biêşînin.

**DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Di van rojên dawîn de di navbera we û hevalên we de dilsariyek heye. Belkî sebeb, dinya we ya hissî be.Li xwe miqayet bin, hûn di vê zivistanê de nexweş nekevin. Meraq nekin, tiştên wiha ji bo demekê bi herkesî re çêdibin.

**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Gava hin kes neheqiyekê li we dikin, hûn hîç guh nadin van tiştan. Tu dibêjî qey ew tişt ne li hemberî we têne kirin. Hûn jî baş nizanin bê ka hûn li hemberî xwe an li hemberî însanên din bêeleqe ne.

# Ka eyran meyranek jî tune?

Rojekê li navçeyeke Sêrtê, Ehmedê şişko diçe loqenteya "Ortadirek"ê ya Litfiyê e-reb, ku xwarinê bixwe. Kesên ku têne loqenteyê yan porsiyonek yan jî porsiyonek û nîv dixwin. Ehmedo gava diçe loqenteyê, ji Litfî du porsiyon û nîvan dixwaze.

Litfî dibêje,"malmîrat, tuyê çawa ewqas donerî bixwî? Ehmedo dibêje,"Willeh ez dikarim donera te tevî jî bixwim." Li Litfî dibe eqs, dibêje, "Tu donera min tevî bixwî, ez ji te banqinotek pere nastînim, lê ku tu nikaribî ezê heqê tevî ji te bistînim." Ji ber ku pereyên Ehmedo tunin, dengê xwe nake. Lê giregirên navçeyê jî, li loqenteyê ne û vê axaftina di navbera wan de dibihîsin. Dibin kefîlê Ehmedo. Litfî, dest bi birîna donerê dike, Ehmedo ji dest bi xwarinê dike. Ehmedoyê meyê gewr, nên jî dixwaze.

Litfî dibire û Ehmedo dixwe. Doner, êdî tê ber xelasbûnê. Litfî ji Ehmedo re dibêje, "Ehmedo lawo bes bixwe tuyê bimirî, te guneh e, zarokên te hene." Lê Ehmedo doner xelas dike, li dora xwe dinêre, qetek nanê wî li ber maye. Berê xwe dide Litfî û dibêje, "Litfî, rihmel li dê û babê te, ka eyranek meyranekî te ji tûne ku tu bidî min?" Litfî, radihêje kêra donerê û diçe Ehmedo...

**SOFÎ BETAL**

# Derewên azmanî û derewên li ser zeviyê

Tê gotin ku du bira hebûne, yê biçûk derewkarekî mezin bûye. Tim di odeyan de cihê xweş jê re bûye. Birayê mezin jê çavnebarî kiriye.

Rojekê ji birayê xwe yê biçûk re dibêje: "Ezê jî êdî derewan bikim. Tu dikî xelk qîmetê dide te. Te li serê odeyê û li cem mezinan didin rûniştandin. Xwarina xweş didin te. Ez jî ku ji te mezintir im û kekê te me, li ber şekalan ji xwe re rûdinim. Nabe, ezê jî dest bi viran bikim."

Birayê biçûk dike, nake nikare kekê xwe îqna bike ku ji derewkirinê re jî qabîliyetek lazim e. Her du bira li odeya gund rûniştî ne, civat şên e. Her kes ji xwe re behsa tiştekî dike. Birayê mezin xwe ranagire û dibêje: "Gelî civatê, min îro dît ji asîmanan dengê hewtina cewrikan dihat."Vite vit kete nav kesên li civatê. Ji her seriyekî dengek derket. Jê re gotin: "Malnexerab, kûçik li asîman çi dikin? Ewqas jî derew nabin lo."

Birayê mezin di cihê xwe de zer dibe, mat dimîne. Birayê biçûk tê hawara wî: "Malavanno! Dibe ku bazek, teyrek ew bi pençeyên xwe hildabe jor. Tiştên wisa carinan diqewimin. Dibe ku birayê min baz an jî teyr nedîtiye, lê tenê kûçik dîtiye." Civat li vê gotina birayê biçûk bawer dike. Dema ku civat belav dibe, her du bira dikevine rê. Gava her du birayên derewîn derketin derve, yê biçûk ji yê mezin re got: "Malava, min negote te derewên azmaniyê bike. Min got derewên ser zeviyê bike. Êdî ji niha û bi şûn ve derewên azmanan bi min nayê pînekirin. Gerek e tu dev jê berdî."

Ez jî, ji Çillerê re dibêjim : "mala te xerab be, ewqas jî bêbextî çênabe. Ji niha û bi şûn ve tu jî dev ji derewên azmanan berde. PKK ne li azmana ye, ew di dilê gel de ye. Lê derewên te yên li ser zeviyê jî du qurûş pere nakin."

**PISMAMÊ WE**



## ÇIRÛSKIN JI RAMANÊN OSMAN SEBRÎ

# 'Gelên negihîştî, peyayên xwe yên xurt û hêja dimirînin'

**Di wê dema kambax de, dema ku piraniyên me, –ger em nebêjin me gişkan– hişên xwe li pirezeyên xelkê diçêrandin û yê tevî jîr ji me bi dizî êrîşî kolegîriya kesan dikir. Hingê bêdudilî Osman Sebrî di kar û nivîsên xwe de bêtirs û perwa şerê kolegîriya kes û ramanan dikir.**

Eger em wêneya hişên kurdî têxin bin hûrbîneke rewşenbîrî, emê bibînin ku Osman Sebrî ne tenê xebatkar û torevanakî dilêr û mêrxas bû, lê belê ramangirekî bi serê xwe û azaser bû jî.

Di wê dema kambax de, dema ku piraniyên me, –ger em nebêjin me gişkan– hişên xwe li pirezeyên xelkê diçêrandin û yê tevî jîr ji me bi dizî êrîşî kolegîriya kesan dikir. Hingê bêdudilî Osman Sebrî di kar û nivîsên xwe de bêtirs û perwa şerê kolegîriya kes û ramanan dikir, "Rast e, dema koledar ji welatê me biderkevin, welat serxwe dibe, lê kurd aza nabin, azadiya gelekî bi xelasbîna wî ji kolegîriya ramanên biyanî ye." (Derdên Me, R.4)

Lê ev ne nîşaneke ku wî nedixwest mirov kulîlkên ramanên cihanê bêhn bike û hinan ji wan di nav axa hişê xwe de kedî bike. Wî dixwest mirov taybetiya hest û rihê xwe ji bîr neke û winda nebe. Ji lewre gava ku dît piraniya kurdên me dibin komunîst, xwe ji dîroka gel û welatê xwe dişon, ji wan re got, "bibin komunîst, komuîstên kurd, kurdên komunîst (Apo, R.102) û dema li Şamê rastî komek kurdên ji bakurê Kurdistanê hat, nasî ku ew diçine hecê, wî piştî guftûgoyeke dijwar, ew tev –ji bilî kalekî hişzingarî– vegerandin welêt.

Erê vegerandin welêt, piştî ku di mêjiyê wan de nivîsand, "Ji min bizane riya bihuştê. Bi xebata rast bibe zengîn, çi gav em aza bûn hingê dikarin wê ferza Xwedê bikin eda. Bi dilekî geş, rûyekî spî herin Hicazê bo mala Xuda." (Derdên Me, R.11–12)

Ji lew re ji Celadet Bedirxan re got, " Çar tîp ji elifbêya te kêm in, ew jî ew in, " 'p,'ç, 't, 'k." Gava Celadet got, "elifbêyên Ewrûpî di navbera 29–31 tîpan de ne, ev e elifbêya me bû 33 tîp" (Elifbêya Tikûz, R.2). Wî lê vegerand, " Ezbenî elifbê goreyî dengên di zimên de tê danîn" (Derdên Me, R.31), "Em ne Ewrûpî ne. Hêja ye ku em jî wekî wan di riya jînê de bi pêş kevin, lê ne bi kêmkirina tîpên elifbê" (Elifbêya Tikûz, R. 2)

Dêmek, em dikarin bibêjin ku raman mîna cawekî ye, herkes dikare li gorî cendekê xwe, bidirû û li xwe bike. Mixabin, em kurd an wek xelkê ji xwe re dirûtiyê jê pars dikin û li xwe dikin pê dibin qeşmer an em datînin ser serê xwe, jê re koletiyê dikin, tazî dimeşin û xwe pê ji germa havînê û serma zivistanê naparêzin. Osman Sebrî dizanibû ku nezanî kaniya derdên me ye, lê baş jî dinasî ku zanîn tenê derdê me venamirîne. Herwiha wî zanîn bi sinçî û baweriyê ve girê dida"Çiqas ku zanîn tiştekî pir hêja ye jî, bêsincî û bêbawerî dibe jehr û riya neqenciyê li pêş xwediyê xwe hêsan dike." (Derdên Me, R.3)

Bi vî awayî û di vî warî de, wî ne tenê digot, dikir jî. Gava di zindanên dijmin de dixwestin bi zora lêdanê gotinan jê biçînin û pê nêçîra hevalên wî yên "partiyê" bikin. Li wan vedigerand, "Ez endamê komîteya navendî me, ez her tiştî dizanim, lê tiştekî ji we re nabêjim."

Wisa wî pişta qelsî û bizdokyê dişikand û bêdilovanî şerê qels û bizdokan dikir, digot,

**Osman Sebrî ne bes raman ji memikên felsefeyên cîhanê mêtibû û bi havênê bîranîn û xewnên xwe, di mejiyê xwe de meyandibûn. Felsefeyeke bawerîanîna xurt jî, di dan û standinê de li ba wî serî hildida. Her wekî carekê kurdnasekî Ewrûpî jê re dibêje, " Osman tu kurd î an misilman î ?" Ew lê vedigerîne, " ez mirov im, paşî kurd im, paşî misilman im."**

"Sîleyek ji bo sitemkar, du sîle ji bo sitembar, ji ber ku qelsiya sitembar sitemkar çar kiriye." (Elifbêya Tikûz, R.18)

Bêguman, liberxwedana di zîndanên koledaran de celebek lehengiyê ye, lê divê mirov bêyî liberxwedan jî nekeve nav pencên dijminan, "dil dixwest ku mêrxasên me kurdan bi hêsanî gewriya xwe nedana destê neyaran. (Kurd di dewsa ku) di zindanan de bi bêbavî bêne kuştin, bila di serê çiyan, di nav lat û zinarên welêt de neyaran xwe bikujin û bêne kuştin çêtir e." (Çar Leheng. R.2).

Osman Sebrî ne bes raman ji memikên felsefeyên cîhanê mêtibû û bi havênê bîranîn û xewnên xwe, di mejiyê xwe de meyandibûn. Felsefeyeke bawerîanîna xurt jî, di dan û standinê de li ba wî serî hildida. Her wekî carekê kurdnasekî Ewrûpî jê re dibêje, " Osman tu kurd î an misilman î ?" Ew lê vedigerîne, " ez mirov im, paşî kurd im, paşî misilman im."

Ewrûpî dibêje,"Çawa?"

Ew dibêje, " Gava ji diya xwe bûme min tiştek nizanî, lewre berê ez mirov bûm, paşê hînî zimanê kurdî bûm û di dan û standinê, rabûn û rûniştinên min de taybetiyên kurditiyê hatin çandin, bûm kurd, paşê ji min re gotin, 'Xwedê heye, û Mihemed pêxemberê wî ye , ez bûm misilman."

Ewrûpî dibêje, " Ev ne rast e, ez, (gava) ji diya xwe bûm, file bûm."

Osman Sebrî lê vedigerîne: "Ger mîrê mirinê, gava tu nû bi zikê diya xwe ketî, bavê te biçiniya û diya te yekî bozî (budîst) bikira û pê re biçûya Hind û piştî ku tu bûyî diya te jî bimira, bozî tu têxista nimêjgeheke bozî, gelo ma hingê tu yê bibûya file an bozî ?"

Ji aliyekî din ve jî, ji vê gotina wî tê fêhmkirin ku wî mîna Ehmedê Xanî* rolekî mezin di jîna miletan de daye zimên," Îro tiştê ku me ji windabûnê bifilitîne hînbûna xwendin û nivîsandina bi zarê xwe yê şîrîn û delal e." (Derdên Me, R.8)

Li dawiyê hêvî dikim ku ev gotar bibe bangeke ji bo dadperwerîna Osman Sebrî û hemû kesên wî, da ku ew di gorê de jî, ji ber me nenale û nebêje, " Gelên vejî, peyayên xwe yên mirî divejînin,



gelên negihîştî peyayên xwe yên xurt û hêja dimirînin." (Elifbêya Tikûz, R.17)

**Perawêz;**

Kolegîrî: Koletî, ibadet

*Mixabin nivîsarên Ehmedê Xanî tijî peyvên erebî ne.

**RÛXWEŞÊ ZÎVAR**

www.arsivakurdi.org

## LI HEMBER ASÎMÎLASYON Û JI HEV BELAVBÛNÊ

# KURDÊN ŞÊXBIZINÎ LI BER XWE DIDIN

Dil megirin dil giran e
Dilê min je caniman e
Ê ke dilê min nenasî
Dwêtê nazê Nerîman e
Hawar nêmê Dwêtê nêmê

Xwar dêyeman darî vî ye
Jin eskere çave vî ye
Ê ke yarê min nenasî
Dwêtê nazê Nerîman e

Maletan le Daxlerbaşî
Daginê we qizilbaşî
Kî çe disî bila wîşî
Naw û zikim ray dixaşî

Dil megirin dil acî ye
Sevdayî dilê we sancî ye
Min çim hendi sawcî ye
We dil girtandin qay suç niye.

**Strana evînî ya li jor di nav Şêxbiziniyan de pir tê zanîn. Ev kurdên ji welatê xwe dûrketî, ji stranên xwe yên kurdî dûr neketine. Şêxbizinî êleke kurd a pir mezin e. Di pêvajoya sê sed salên dawî de ji ber zilm û zora îdareyên zilimkar gelek cih guhertine, koçber bûne, ji hev hatine belavkirin. Lê tevî vê yekê jî, hev din bernedane, dev bi ziman, çand û edetên xwe yên kurdîtiyê ve girêdayî mane. Asîmîlasyona ku dewleta tirk ji berê ve li ser wan pêk aniye, îro bi awayên din be jî, didome. Li ser rewşa dawî ya van kurdên sitembar me bi mamosteyekî Şêxbizinî, Hemdî Dêllê re xeber da.**



**Kurdên Şêxbizinî jî wek hemû pîrekên Kurdistanê nanê sêlê çêdikin.**

**Birêz Hemdî Dêllê hûn dikarin xwe bidin naskirin?**

Ez li gundê Sindiran li Haymanayê dijîm. Haymana qezaya Enqereyê ye. Ez mamosteyê dibistanê me. Lê niha ez rêncberiyê dikim.

**– Hûn dikarin li ser eşîreta xwe xeber bidin. Hûn kengê û ji bo çi hatine Haymanayê?**

Navê eşîreta me Şêxbizinan e. Li ser hatina me ya Haymanayê du dîtin hene. Ya yekê, di sala 1514'an de Yavuz Sultan Selim di dema Şerê Çildêranê de, bi Îdrîsê Bilîsî re ji bo bicihkirina hin eşîrên kurdan li aliyê rojavayê li hev hatiye. Di wê demê de ev eşîret di nava axa Îranê de ye. Sultanê Osmanî, sozê heq û hiqûqê daye û ev e Eşîra Şêxbizina anîne li Palû û Siwêregê bi cih kirine. Ji Kurdistana Başûr, ji dora Kerkûkê û ji Herêma Baziyan, kurdan koç kirine bakurê Kurdistanê. Piştre di salên 1800'an de koçeke din kirine û hatine Haymanayê.

Li gorî dîtina din, di sala 1806'an de ji kurdên Baban Abdurrahman Paşa li hemberî Osmaniyan serî hildaye. Şêxbizinî jî, ji kurdên Baban in. Piştî serhildanê Şêxbizinî bi darê zorê li Haymanayê hatine bicihkirin.

**– Navê eşîreta we ji ku derê hatiye?**

Eşîreta me ji Herêma Baziyan veqetiye. Ji ber vê yekê jî, berê navê eşîretê "Şêxê Baziyan" bû. Ev nav di qonaxa dîrokê de hatiye guhartin. Navê îro, bi vî awayî derketiye.

**– Navê zaravaya we çi ye?**

Şêxbizinî, devokek ji soranî bi kar tînin. Ew wekî zaravayê soranî ye. Li gorî bikaranîna dem û lêkeran (fiêlan) lehçeya me wekî soranî ye. Lê ev, car caran wekî "Erdelanî" ye jî.

**– Di eşîreta we de çi guherîn çêbûne?**

Dema berê, eşîreta me ji malbatên mezin dihate holê. Eşîretek xwe bi xwe bû, anku girtî bû. Li ser eşîretan "beg" hebûn. Wan began eşîret bi rê ve dibir. Mirov û mela û qonaxên began ên xweser hebûn. Began mirovên ku dixwestin rê dikirin leş-

*Wekî li jêr tê dîtin, lehçeya Şêxbizinî, gelek nêzîkî soranî ye û zehf nêzîkî Erdelanî ye jî.*


| Şêxbizinî | Kurmancî | Soranî |
| --- | --- | --- |
| min gevram | ez mezin im | min gewrem |
| min vîtim | min got | min wît/witim |
| mala man | li mala me | le mal man |
| ime xuman | em bi xwe | ême xoman |

| Şêxbizinî | Erdelanî |
| --- | --- |
| Jîngel | Jîngel |
| Zimîstan | Zimîstan |
| Insan gelîman | Piyawgelman |

www.renakurdi.org



Kurd ji her aliyî ve ji terşê xwe îstifade dikin. Ji bo şewata zivistanê havîn û biharê jinên kurd ji rêxê tepik û taran çêdikin.



Malbatên Şêxbizinî dawiya havînê, piştî ku genimê xwe ji bênderan radikin, li ber devê deriyê xwe wî paqij dikin.

keriyê. Yên nedixwestin rê nedikirin. Cilên began ên taybetî, xweser hebûn. Şimşîr, cida, kirbaç, gopal, cezme li xwe dikirin. Gundî li ber deriyê wan began rêncber bûn. Şivanî û gavaniya wan dikirin. Piştî ku feodalîzm li paş ket, ev tiştên berê jî neman. Piştî cumhuriyetê cihê van began mirovên partiyan girtin. Ji bo karê xwe van mirovên partiyê û mirovên siyasetê eşîret bi kar dianîn. Lê eşîretên mezin ji ber ku axayê wan biçûk bû, koç kirin Enqereyê.

**– Eşîretên cîranê we yên kurd kî ne û têkiliyên we bi wan re çawa ne?**

Ji xeynî Şêxbizinan, Terîkan, Rişvan, Şihhan, Canberg, Jirîkan û Omeriyan hene. Ev eşîret tev bi kurmancî dipeyivin û hemû ji Riha, Semsûr (Adıyaman) û Meletê, di salên 1800'an de hatine. Li dora me bi cih bûne. Şêxbizinan li Tirkiyê belav bûne û cihê çûne jî wekî 10–15 gundan bi hev re dijîn.

Li Sînop– Bayabat, Adapazarı– Geyve, Çorum– İskilîp, Amasya– Merzîfon, Adana– Ceyhan, Hatay– Îslahiyeyê Şêxbizinî rûdinin.

**– Li Haymanayê Şêxbizinî di çend gundan de dijîn?**

Li Haymanayê û dora wê 36 gundên Şêxbizinan hene. Ev gund bi rêncberiyê dijîn. Xasma pez û dewar jî zehf e. Li aliyê me li ser vê yekê, gotineke kevin jî heye. Dibêjin: "Kurmanco pez, felaho hes." Di însanê me de, şeroyî û jîrîtî heye.

**– Hûn dikarin çend navê xwarin, leyîstok û gotinên kevin ên eşîreta xwe ji me re bibêjin?**

Wekî navên xwarinan:Mîrge, miglême, pelîsle, hêsîle, sirîmast, helavî, hewîrê sîr, çolqemast dikarim bibêjim.

Navên leyîstokan: Sî kuciqa, hogogo, kaçaxane, urcî karocone, palaqane, kune rugî, qittîganê.

Li dawetan jî; gowend, sîpa, singsing tê leyîstin.

Gotinên pêşiyan jî:

... Aqilê sivik, barê giran

... Le şêr û şêwistane da way, le goristanê niyay.

**– Hûn dikarin çend navên gundên xwe bi kurdî ji me re bibêjin?**

Navê gundê me "Gozgoz" e. Gundên cîranê me; Şawlu, Caniman, Xorxor, Sazza, Yêrgom, Tûrron, Xêwend, Bacîxêsar, Lêr, Ewdallî.

**– Birêz Hemdî Dêllê, dîroka fermî we bi çi awayî dibîne?**

Li gor dewletê, eşîreta me ji ereban tê. Dibêjin "Hûn ji sulaleya "Îmam Muhammed El–Bakir, Zeynel Abidîn û Şêx Selaheddîn tên." Lê ewê han tiştekî pûç e. Lewre koka me ji kurdan tê.

**– Li eşîreta we, ol (dîn) bi çi awayî tesîr kiriye?**

Dema berê hindek bawerî hebûn, ku koka wan digihîşte Zerduştiyê. Mînak; rojên me yên kêfxweşiyê em derdiketin cihekî bilind û me agir pê dixist. Niha jî em agir bi avê natefînin, lewre guneh e. Dema em pirça xwe û neynokên xwe jê dikin, em wan veydidin û dixine qulekê, da ku axa me neherime. Lê niha ev bawerî zehf nemane. Di vê demê de, gundiyên me dikevin terîqetan. Ev terîqet însana jî tew karên dinyayê diqetîne berê wan tenê dide axîretê. Lê gundên cîranê me yên tirk ev tişt zêde tune. Ev jî kifş dike ku polîtîkaya dewletê ye.

**– Eşîreta we bi çi awayî li meseleya kurdî dinêre? Hûn dixwazin vegerin Kurdistanê?**

Însanên vir li ser axê bi cih bûne. Ji ber vê yekê jî, ji têkoşînê ditirsin. Lewre, ditirsin ku wê axa wan û rehetiya wan ji dest here. Li ser kurdên vir şideteke fizîkî tune. Ji ber antî–propagandayan memûr, mamoste û meleyan jî, gelek mirov xwe nêzîkî têkoşînê nakin. Lê, di gel vê yekê jî kurdên vir, teşkîlatên HEP, DEP û HADEP'ê vekirine û têkoşîna xwe li wan deran dom dikin. Em dikarin bibêjin ku kurdên me yên vir, alîkariyê didin têkoşîna siyasî û çandî.

**Li gor dewletê, eşîreta me ji ereban tê. Dibêjin, "Hûn ji sulaleya Îmam Muhammed El–Bakir, Zeynel Abidîn û Şêx Selaheddîn tên." Lê ewê han tişteke pûç e. Lewre koka me ji kurdan tê.**



**Hevpeyvîn:**
**J. SERHENG**
**ŞEHMUS ARSLAN**

## Qumandarê ARGK'ê Xebat:

# 'Ji artêşa tirk firar zêde dibin'

*Qumandarê ARGK'ê Xebat di saloxa ku daye Kurd A' de dibêje, "Dijmin êdî di nav qerergahê xwe de asê maye. Li her deverê ji ARGK'ê derbeyan dixwe. Artêşa tirk 'ya mezin û bidisiplin,' îro li ber êrîş, cerde, û kemînên me nikare gavekê bi pêş ve biavêje. Li deverekê gerîla û leşker şer dikin, di şer de bi bêtêlê qumandarê tugayê hêza teqwiye dixwaze. Lê ji tirsa gerîlayan tu hêz nayê. Gava di artêşekî de emir neyên cih ew artêş ji artêşiyê dertê. Her roj 10-15 leşker firar dikin. Li Misirca Sêrtê van rojan gelek leşkeran firar kir. Yên firar dikin, gelek jê tên xwe digihînin hêzên ARGK'ê. Ewên din jî direvin Ewrupayê. Lê çapemeniya cenga taybet van bûyeran nade der."*



**Li gor qumandarê ARGK'ê, gerîla artêşa PKK'ê ji ya tirk pir birêkûpêktir in.**

**14.12.1994**

Li nêzîkî goristana Mêrdînê, erebeyeke tîmên taybet wergeriya. Tîmên di erebeyê de birîndar bûn. Birîna du tîman xedar e.

Li Pîrana Diyarbekirê, li gundê Doğamayê –ku gundê cerdevanan e–, gerîla êrîş kirin ser gund. Di êrîşa gerîla de cerdevanek mir, gelek cerdevan jî birîndar bûn.

Li Mêrdînê li navbera Hezex û Kerboranê di navbera gerîla û leşkeran de şer derket, 2 leşker mirin, 4 leşker jî birîndar bûn.

Li Stenbolê li semtên Beyazîd û Laleliyê bombe teqiyan. Mirovek mir, 10 kes jî birîndar bûn. Kes li van bombekirinan xwedî derneket.

**15.12.1994**

Cendekê Ebûqatê kurd Faik candanê ku ji roja 2'ê berfanbarê ve windabû, li Enqereyê li navçeya Balayê hate dîtin.

Gundên Xerebaba, Axtê, Cinata, Xelatê, Kurikê û Cibilgiravê ji 11'ê berfanbarê û vir de di bin eblûqaya hêzên dewletê de ne. Ev gund ji ber eblûqaya zad, di sînorê birçîbûnê de ne.

**16.12.1994**

Li Stewra Mêrdînê gundê Elfan 10 malên gundiyan ji aliyê hêzên dewletê ve hatin şewitandin.

Gundê Xirbêkermêtê ya Mêrdînê, ji aliyê leşker û cerdevanan ve hate valakirin.

**17.12.1994**

Li Diyarbekirê li semta Bağlarê mirovekî bi navê Fikret Turan hate kuştin. Tê gotin ku Fikret Turan alîkariya dewletê dikir. Kuştina Fikret Turan ERNK'ê hilda ser xwe.

Di navbera Nisêbîn û Hezexa Mêrdînê di nav hêzên dewletê û gerîlayan de şer derket. Di şer de 5 leşker û cerdevanek mirin û gerîlayek birîndar bû.

Li çola Dêrsimê, di navbera gerîla û leşkeran de şer derket. Di şer de 2 leşker mirin, leşkerek û gerîlayek birîndar bûn.

Li gundê Dedaş, li Hezroya Diyarbekirê gerîlayan girtin ser gundê cerdevanan. Di cerdê de 4 leşker û 3 cerdevan mirin.

Li Stenbolê, taxa Esenkentê mirovek bi çekê hate birîndarkirin. Tê gotin ku ew kes ji serokên faşîstên Esenkentê ye. Ev livbazî ji aliyê TÎKB'ê ve hate kirin.

Li Stewra Mêrdînê gundê Cirzê ji aliyê leşkeran ve hate şewitandin.

Gerîlayên ARGK'ê li kampa Xerzanê, boriyên petrolê bombekirin.

**18.12.1994**

Li Mêrdînê mintîqeya Hepizbînan hêzên dewletê operasyon kirin. Di operasyonê de leşker ketin kemînên gerîlayan. Di kemînên gerîlayan de 14 leşker mirin, gelek jî birîndar bûn.

Li Hezroya ku girêdayî Diyarbekirê ye, li gundê Kanderharê cerdevanan di nav xwe de şer kir, cerdevanek mir û 2 cerdevan jî birîndar bûn.

Li gundê Çiftlik yê Bazidê di navbera leşkeran û gerîlayan de şer derket, 2 leşker mirin, 3 gerîla birîndar bûn.

**19.12.1994**

Li Berwariya Sêrtê gundê Tîrya gerîlayan cerdî ser tabur û qereqolê kir, 11 leşker mirin û 8 leşker jî birîndar bûn.

Li navçeya Êlihê, li Qubînê li gundê Barinçê gerîlayan êrîşî ser qereqolê kirin. Di êrîşê de 16 leşker û gerîlayek mirin, gelek leşker jî birîndar bûn.

Li Diyarbekirê li çola ku di navbera Hazroyê û Licê de ye, gerîlayan û leşkeran şer kirin. Di şer de 3 leşker û cerdevanek mirin, gelek ji wan jî birîndar bûn.

Li Agiriyê li çiyayê Tendurekê di qereqola seyar de 6 leşker di nobetê de qerisîn û mirin

**20.12.1994**

Li Mêrdînê leşkerên derketin operasyonan, li mayinên gerîla qelibîn. Piştî qelibînê, di navbera gerîlayan û leşkeran de şer derket, 14 leşker û gerîlayek mirin.

Li Êlihê taxa Sağlıkê mamosteyek hate kuştin. Mamoste li derdora xwe wek welatparêzekî dihate nasîn.

Li Midyada Mêrdînê dixtorê suryanî Edward Tanrıverdi hate kuştin. Tê gotin ku qatilên dixtor, endamên kontrgerîla ne.

**21.12.1994**

Li Kerborana Mêrdînê qereqola Klavuz ya cendermeyan bû armanca ârîşeke gerîlayan, uzman çawîşek û gelek leşker mirin.

Li Diyarbekirê navçeya Xanê gerîla li pêş hêzên dewletê kemîn danîn, 3 leşker mirin û gelek leşker jî birîndar bûn.

Li Kerboranê gerîla bi leşker û tîmên taybet re ketin şer, 4 tîmên taybet û 2 astsubay mirin û gelek leşker birîndar bûn.

Li gundê Findikê yê Sêrtê minibûseke gundiyan li mayinê qelibî, 5 kes mirin, 4 kes jî birîndar bûn. Derheqê xistina mayinê de tu salox û agahî bidest neketin.

**Navenda Nûçeyan**




**Belgeya ku Çiller'ê îmze avêtiye binî wek, fermannameya sekinandina rojnameya Özgür Ülkeyê ye.**




## Bombekirina Özgür Ülke û Talîmatnameya Çiller

Rojnameya Özgür Ülkeyê, di 19.12.1994, hejmara 235'an de belgeyek ku ji aliyê serokwezîr Tansu Çiller ve hatiye îmzekirin, wek nîşana emrê bombekirinê rê da.

Li gorî Özgür Ülkeyê, Çiller bi vê belgeyê hem xwe û hem jî dewlet daye dest.

Di belgeya ku ji aliyê Çiller ve di 30.11.1994'an de hatiye îmzekirin de tê gotin ku lazim e saziyên dewletê rê li ber weşanên wiha bigrin. Tarîxa bombekirina Özgür Ülkeyê, piştî îmzekirina vê belgeyê bi sê rojan e.

Li ser belgeya ku Ülkeyê derxist holê gelek saziyên serbixwe reaksiyon nîşan dan û dewlet rexne kirin. Serokê Partiya Gel ya Demokrasî HADEP, Murat Bozlak, li ser vê meseleyê got ku tewra kesên ku vê bûyerê (dîtina belgeyê) normal dibînin, tiştekî ecêb û wahîm e.

Ji aliyê din ve serokwezîr Tansu Çiller jî beyanatek da û îdîayên Özgür Ülkeyê nerast nîşan da.

**Navenda Nûçeyan**



## Guh bidin qirîna li girtîgehan

Li girtîgeha Elezîzê 250 girtiyên siyasî ji ber dijwarbûna şertên li hundir û zilma îdareyê 44 roj in ku ketine greva birçîbûnê. Gelek girtî hatine sînorê mirinê. Hinek ji wan di grevê de felc derbaskirin. Gelek girtî zerekî û emelî bûn û hinek jê xwînê dadikin.

Li ser navê girtiyên siyasî Ahmet Aslan ev salox da berpirsiyarê HADEP'a Diyarbekirê, " Em ji bo mafên xwe yên mirovahî ketine vê grevê. Rêveberên girtîgehê dest danîne ser hemû mafên me. Divê raya giştî guh bide dengê me." Li Entabê, li Elbistanê û Pirînê jî girtiyên siyasî di grevê de ne.

Xebatek li ser paşgirên di kurmancî de (1)

# LI GOR CELADET BEDIRXAN 69 QERTAFÊN KURDÎ HENE

Di serî de min divê ku ez sînorê vê xebata xwe daxuyînim. Ezê bi tenê li ser paşgirên di zaravayê kurmancî de rawestim. Ji aliyê din ve ezê wan paşgiran li gorî peywirên (wezîfeyên) wan ji hev venaqetînim.

Bi kurtasî be jî, dixwazim çend gotin li ser qertefan bibêjim. Di kurdî de hem pêşgir, hem paşgir, hem jî navgir hene. Ev qertaf (pirtik) bi serê xwe, bigiştî, ne xwediyê maneyekê ne. Di zimanê me de qertafine hene ku ji koka lêkerê tên. Ji bo nimûne kar, ber, ker. Lê êdî ew mîna qertaf têne bikaranîn.

Bi qertafan nav û rengdêr têne çêkirin. Divê ez vê yekê jî bibêjim ku ji raweya fermanî ya lêkerê jî, paşgir bi dest têne xistin. Nimûne: Bigire, an jî bigir. Di vê mînakê de "bi", ya fermanê ye û "gire" an jî "gir" kok e. Bi "gir"ê ku em peyveke nû çêbikin; govendgir.

Wekî ku min di destpêkê jî de got, ezê li ser "qertafên" ku ji koka lêkeran tên bidestxistin, ranewestim.

Min heft kitêbên gramera zimanê kurdî, der heqê paşgiran de vekolandin. Serê pêşîn ez dixwazim van vakolanên xwe bi awayekî bi ser re pêşkêş bikim:

1. Di kitêba gramera kurdî ya Emîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot de, 69 qertaf mîna paşgir hatine nîşandan. Li gorî vekolîna xwe, ez dikarim 16 qertaf jê ji paşgiran nehejmerim. Li hêla din ji qertafan dîsan 2 jê bi tirkî, 2 jî bi soranî ne.

Li gorî rêza alfabetîk, paşgirên di vê kitêbê de ev in:

a, ahî, ak, al, ane, anî, ar, asa, asî, ban, bar, baz, bend, ber, dank, dar, e, ek, fam, gaz, geh, gîn, gon, ik, istan, î, în, înî, îtik, kar, ker, mal, mend, nak, ok, ole, olek, olik, onek, or, oyî, ox, tî, ûr, van, war, wer, xane, yar.

di dawiya nivîsa xwe de li gorî baweriya ku di vekolîna min de ya li ser paşgiran ji min re çêbûye, ezê hemû paşgiran bi rêz bikim

Di kitêba ku li jor navê wê bihurî de, paşgirên ku bi ya min şaş in jî ev in:

An: Aliyan, heyr–an

"An" qertafa piraniyê ye, têkiliya wê bi paşgiriyê nîn e. Di peyva "heyran"ê de jî "an" êdî hêmanê lêkerê ye. Dema ji nav an jî rengdêrekî lêker bê çêkirin "andin" pê ve tê danîn. Nimûne:

Reng– rengandin, Heyr– heyrandin.

Di rewşa jorîn de lêker derbasî ne. Heke bikevin rewşa nederbasiyê îcar dibe heyirîn. Bi vî awayî "î" ya di peyva "heyirîn"ê de li "a"yê dadigere dibe heyiran. Jixwe "heyirîn" di rewşa kişandî de ye û ji bo piraniyê ye. Em heyirînji bo raweya nederbasî, me ew heyirandin jî, ji bo raweya nederbasî ye.

Bare: Dubare, rencbare

Dema ku tê paşiya peyvê, maneya tekrarê û çend cariyê dide.

De: Şermende

Di vê mînakê de qertaf ne"de" ye, lê ende ye.

Êr: Dilêr

Peyveke hevedudanî ye û ji "dil" û "êr" pêk hatiye ku"êr" jî raweya tewangê ya "ar" e; nolî "agir" jî tê bikaranîn.



Mîr Celadet Bedirxan

Reng: Sorereng

Bi alîkariya "e"yê ya "navgir" peyveke ku ji sê hêmanan pêk hatiye, çêbûye.

Sar: Şermesar

Qertaf bi xwe ne "sar" lê "zar" e. ji bo nimûne; şermezar, tengezar.

Înok: Xapînok

Pey ji "xapîn" û "ok"ê hatiye holê.

Îfk, ivk, işk: Gulîfk, germişk.

Heke em li ser "germişk"ê rawestin. Germ, bi serê xwe rengdêr e, dema ku jê lêker were çêkirin, an wê bi alîkariya qertafa "andin" an jî bi ya "ijandin"ê serî li vê riyê bê xistin. Nimûne:

Germandin, nermandin an jî germijandin, nermijandin.

Nexwe em dikarin bibêjin ku kok "germij" e û bi alîkariya paşgira "k"yê peyv hatiye afirandin.

O: Zero, xapo

Tê zanîn ku ev "o" hem ji bo zayenda nêr e. Di dema baneşanê de tê bikaranîn, hem jî dikare bê paşiya çi navê mêran û çi jiyê jinan, be Mînak:

Kendal; Kendo

Rindê; Rindo

Dêr: Çavdêr, navdêr

Bi ya min ev "dêr" raweya tewangê ya qertafa "dar"ê ye.

Ver: Gilover

Dibe ku qertaf "over" be, ji bo ku peyveke me ya bi navê "gilok"ê jî heye.

Dok: Birandok, xeberdok

Di vir de jî li gorî mînaka "xeberdok"ê mirov dikare bifikire ku qertafeke welê heye, lê di ya "birandok"ê de na. Ev qertaf "ok" bi xwe ye.

Eke: Bendeke

Rastiya peyvê "berdenke" ye û bi pêşgira "ber" û peyva "denke"yê pêk hatiye. Qertafeke bi navê "eke" nîn e.

Du qertaf jê bi tirkî ne; daş û çî:

Sînordaş, xêrdaş, defçî, qehweçî

Di karim bibêjim ku ev herdu qertaf "ger" û "vend" ji soranî hatine: Hesinger, beşavend

Vank: Destvank. Ev peyv jî ji sê hêmanan çêbûye: Dest–van–k. Li gorî vê yekê dixuye ku "vank" bi serê xwe tenê ne qertafek e.

Vanî: Şerevanî; jixwe bi qertafa "van"ê peyv hatiye çêkirin, bi "î"yê careke din hatiye çêkirin.

Awer: Bi baweriya min qertaf "wer" e. Dema tê paşiya peyvê hem "a" hem jî "e" dikare bikeve pêşiya wê: Bîrewer, cengawer.

ZANA FARQÎNÎ

## DEFTER

### Kurd û fersendên dîrokî



AMED TÎGRÎS

Wek ku tê zanîn û bîranîn, di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de dewleta Osmanî û hevalbendên wê têkçûn. Jixwe dewleta Osmanî ji binî ve pelişîbû. Ji bo kurdan jî hinek îmkan û fersendên nû û mezin derketibûn holê. Ewrûpiyan pirsa kurdan digirtin rojevê û dest pê kiribûn ku wê aktuel bikin. Peymana Mondrosê di vî warî de mînakek bû. Lê, bi vê yekê re, çend dezavantajên kurdan jî li ser hevdu kom bûbûn. Gelê kurd nezan û li paş hatibû hiştin. Bêrêxistin bû. Bêserok û bêrêber bû. Lê, dîsa bi wî halî xwe jî liv didan xwe. Li bakur, li herêma Qoçgiriyê û li başûr jî, li herêma Silêmaniyê dest bi têkoşîna neteweyî kiribû. Tam di wê demê de, dezavantajekê din jî derdiket pêş kurdan. Yekitiya Sovyetê dihat damezirandin. Bi damezirandina Sovyetê re balansa dinyayê dihate guhertin. Rewşa siyasî ya dinyayê diketin dijberî kurdan.

Di qada navneteweyî de, li ser Osmanî û Tirkiyê hesabên mezin dihatin kirin. Sovyet ji bo ku bikaribe xwe li dijî sîstema kapîtalîst a cîhanî biparêze alîkariya Îttîhat–Terakkî û pişt re jî ya M. Kemal dikir. Ji bo berjewendiyên xwe pirsa kurd bincil kirin û veşartin. Herwiha Tirkiyeyê qasî 70–80 salî fêde ji dijberiyên navbera sîsteman dît û di eynî wextê de ev dijberî baş bi kar anî. Bi taybetî di warê leşkerî de endametiya wê ya CENTO û NATO di vî warî de roleke mezin lîst û hîn jî dilîze.

Niha ev rewşa dinyayê ya siyasî hatiye guhertin. Sîstema sosyalîst belav bû. Balansa du–alî nema. Bi tenê sîstemek ma. Vê rewşa nû, giringiya cihê Tirkiyê ya stratejîk û siyasî ji navê rakir. Tirkiye jî, êdî wekî berê nikare xwe bi buhayê giran bifiroşe. Îro tu dewlet pênc pereyan bi dewleta tirk nadin.

Ji aliyê din ve rewşa kurdan a civakî, perwerdeyî– hîndekarî, siyasî, rêxistinî û leşkerî jî ne wekî dema berê ye. Gelekî li pêş e. Nîv milyon kurd li derî welêt hatiye bi rêxistinkirin. Ev nîv milyon kurdên li derveyî welêt li seranserê cîhanê bûne dengê têkoşîna li welêt. li hemberî bûyer û kirinên li Kurdistanê di eynî demê de, Ewrûpayê dihejînin. Kurd li hemû paytextên Ewrûpayê semîner û konferansan li dar dixin. Cih û warên navneteweyî dagir dikin. Xwepêşandan û hemû cureyên xebatê pêk tînin. Dem û dezgehên kurdan en li derî welêt, bi zimanên cuda cuda hemû kirinên dewleta tirk dinivîsînin û li nav dewlet, dem û dezgeh û gelên Ewrûpayê rojane belav dikin. Di vî warî de, bi dehan kovar, rojname û bultenên kurdan derdikevin. Bi hezaran belavok û afîş tên belavkirin. Faksên kurdan her saet bi serûber û bi zimanên cuda cuda dixebitin. Ting û ringa telefonan e... Di hêla dîplomasiyê de, her ku diçe, kurd li Ewrûpayê derûdor li Tirkiyeyê teng dikin. Divê em kurd vê prosesê baş bi kar bînin. Vê fersendê carekê din jî ji dest xwe nerevînin. Her dem fersend nakevin destê mirov.

www.arsivakurdi.org

LEGEL KOMÎ SERXWEBÛNÎ SORANÎ DA HEVPEYVÎNEK:

# KOMEKEMAN BEŞÊKÎ NEPIÇRAW E LE ŞORIŞÎ SERBEXOYÎ EM ROY KURDISTAN




**Komî Serxwebûnî Soranî**

**Le Sofyay paytextî Bulgarîstan ewe bo beşdarî kirdinî sal rojî PKK hatibûn, komêkî xincîlane û rûh suk in, le sê kes pêk hatwe, tenha sê kes û şadimanî be dil û derûnî gwêgiran da pexiş deken. Sereta pêman witin, detwanin komî serxwebûn man pê binasênin?**

Komekeman le sereta da salî 1988–1989 be nawî Komî Nûjîn ewe damezra, çend hevalêkî bakur û başûrî Kurdistan bûyn, her weha kiçe hunermend "Sozan"îş ke be resen Bulgarî ye le gel man da bû. Paş raperînî 1991'î başûrî Kurdistan û damezrandînî PAK wek rêberaytiyekî şorişgêr, komî serxwebûn weke layengiranî PAK le derewe destî be kar kird, be taybetîş le Danîmark. Le sereta we ta êsta le zorbey bone û mîhrecanekanî Kurdistan da beşdarîman kirdiwe.

**– Êwe be çi amancêk em kometan damezrand?**

Be amancî geyandinî derigî xebat û têkoşînî welat be gelekeman le derewey welat, le heman kaf da nasandinî mosîqa û folklorî başûrî Kurdistan û nizîk bûn ewey ew saman e le hunermendan û hevalanî parçekanî tirî Kurdistan, wek xebatêkî çandî şan be şanî xebatî siyasîle pênawî azadî û serbexoyî Kurdistanêkî yekgirtû û dîmukrat da.

– Diyarî tirîn ew kuraney kirdutan e?

Bêguman le zor bone û mîhrecan da beşdarîman kirdiwe, diyarîtirînyan... Beşdarî le vîstîvalî nêw neteweyî kurd le (Boxim– Almanya), sazkirdinî yekemîn ahengî PAK le Danîmark, beşdarî le mîhrecanî mozîq û folklorî kurdî ke salane Hunerkom sazî dekat, herweha beşdarîman le ahengî salrojî pîroz kirdinî her sê çekî sitratîjî şoriş PKK, ERNK û ARGK.

**– Çon derwanin e emroy mosîkay kurdî le derewey welat?**

Kurd be tenya xakekey dagîr û talan nekrawe belkû çand û hunerekeşî, parastinî hunerî kurdî erkî ser şanî hemwan e. Bela be dax ewe lem rewş e taybetiyey emroy Kurdistan da mosîkaranî ême le derewey welat wekû pêwîst erkî ser şanyan be cê nahênin, le birî ewey le sazimanî hunerî yekgirtû da be hev ra kar biken, herkes serqalî berjewendî taybetî xoyetî û deyewê hunerekey bikate hoyekî pare kokirdin ewe. Hunermend ew kese ye ke girêdirawî gelekey bêt, le gel hemû emaneş da gelê hunermend hen ke hîwa û xoşhalî êmen be taybetî Hunerkom ke bote amêzêkî gerim bo her hunermendêk niyazî xizmetî rasteqîney hebêt.

Le naw biraderanî komeke da kiçe hunermendêkim ber çaw kewit ke Bulgarî ye, be pêwîstiman zanî, çend pirsiyarêkî lê bikeyn, bê guman le pêş da wîstman xoy binasênê... Ew îş be zimanî soranî (soraniyekî rewan) witî: "Naw im Sozan e, le salî 1989 we le gel komî serxwebûn da mosîka lê dedem û be amêrî orig le komeke da beşdar debim."

**– Bo ême mayey xoşhalî ye ke êwe xizmetî mosîkay kurdî biken, belam çî watanî lê kird ke xizmetî hunerî kurdî biken?**

Diyar e rewşî gelî Kurdistan wa le zor kes dekat ke yarmetî bidat, bo ewey rojêk zûtir gelî kurd be amancî xoy bigat, be taybetîş mirovî hunermend ke zûtir hest be azarekan dekat. Hawkarîman le gel gelî kurd da bo herçî zûtir azadî Kurdistan e, takû mosîka û folklorî kurdî îs paş nekewin.

**– Êwe wekû destêkîbe wefa ke xizmet be mosîkay kurdî deken, çon derwanine ew kurdaney mosîka û hunerî kurdî bo xelkîtir dedizin?**

Delêm karêkî naxoş e, çonke her yelew folklorî xoy heye, ew kareş karêkî fire xirape ke folklorî gelî kurd dedizin û be gelanî dinî defroşin, be rastî ew kar e tawan e.

Paş ewey hîway serkewtin man boyan xwast. Sozan xan witî: "Dezanî min îş yekêk im le xwênerekanî rojnamey Welatê Me û be xoşewîstiy ewe çawerwanîm.

Hevpeyvîn:
SÎRWAN NANEREQ



Mindalanî kurd le Ewrûpa le meşî azadî da beşdar debin, legel hunermend û ronakbîran.




## Özgür Halk derket

Kovara Özgür Halk'ê, bi ser navê "Serkeftina sosyalîzmê di tevgera azadiyê de ye" derket. Özgür Halk di hejmara xwe ya 50'yan de cih daye nivîsên tehlîlî, kurtenûçeyên welat û rojeva gerîla. Di vê hejmarê de, nivîsa Alî Fırat ya "Sosyalîzma ku bi tevgera azadiyê derdikeve holê, serkeftina mirovahiyê ye" bala mirov dikişîne. Nivîsên Mustafa Karasu, M. Can Yüce, Mustafa Sarıtemur, M. Sait Üçlü, Bekir Karaç, Nimet Sevim, Ahmet Çapan û Fevzî Yetkin jî di vê hejmarê de hene.

# HIRIS SERRÎ RA VER, HIRIS SERRÎ RA PEY

# Z



Fîlmî Z di yew dîmen.

**Namey fîlmî:** Nêmerde(Z)
**Sermiyan:** Costa Gavras
**Senaryo:** Costa Gavras, Jarge Semprun
**Muzîk:** Mîkîs Theodarakîs

**Kaykerdoxî:** Yves Montand, Jean–Lous Trintîgnant

**Welat:** Yewnanîstan
**Wext:** 22.05.1963

Heme ca di teror, îşkence, merg, surguney... Dewleti faşîsti ya! Dormaredê dewleti di, hinzar û yew kîştoxî, dizdî, bîncî, bêkar û bêgurey û serserî estî.

Dewleta faşîsti zî, nê serseriyanê anasarênan weş gurênena... Pey nînan mêrdiman kişena, cayan veşnena, çi rezîley binê dîna di esta kena. Peynî di zî meb'usê sosyalîstî Lamrakîsî zî kiştiş dana. (22.5.1963)


Inay ser o pancsey hinzar (500.000) ten dekweno kuçan. Telebey, m'elimî, karkerî, dewijî heme sere hewenanî... Hukmatê Karamanlîsî îstifa keno. Sawciyêko canmêrd û egît vejiyêno, kîştoxî ca keno û vejeno meydan. Labelê pey kîştoxî di mêrdimê pîlî estî. Sawcî fek nînan ra zî verra nêdano. No sawcî, çend serrî ra pey Yewnanîstan di beno serekê dewleti.

**Hîris Serrî ra Pey;**
**Welat:** Kurdistan
**Wext:** 04.09.1993 (No fîlm hema nêanciyawo)

Meb'usê kurdan Mehmet Sîncar, hema hema sey Lambartakîsî kişiyêno. Kamî, çirê kişto? Heme çî orte di yo!.. Labelê sawcî Serzatakîs çîno. Roj bi roj hina vêşî qetlîam kenî... Mehmet Sîncarî ra pey, Yusuf Ekinci, Namık Erdoğan, Muhsin Melik, Behçet Cantürk, Savaş Buldan, Av. Medet Serhat, Faik Candan gelekî bînî zî kişiyay. Peynî di zî rojnamey Özgür Ülke veşna.

Eke îmkanê şima esto miheqeq temaşey fîlmê "nêmerdey" bikê. Hina vêş zî temaşey sawcî!..

CEMAL PÎRANIJ



Costa Gavras

# KELEPOR

## Zimanê Welatê Me



DILBIXWÎN

Mijar gelek in. Emê ji we re li ser çi binivîsînin? Li aliyekî çiya bang li me dikin, li aliyekî şehîdên li ser pênûsê, li aliyekî germbûna meşa gelê me ya ber bi azadiyê ve... li aliyê din jî nûçe, mihrîcan, festîval... dilê me dixwaze em we ji tu agahî û nûçeyan bêpar nehêlin. Lê belê tengbûna delîveyê em neçar kirine ku we di hefteyekê de tenê carekê bibînin.

Di vê koşeyê de, destûra me nîn e ku em bi we re dirêj biaxifin û nivîsên dirêj binivîsînin. Tehdîdên Mezher her demê bala me dikişînin ser: "Aman dirêj nenivîsînin, bila nivîsên we kurt bin. Cih teng e, kesên dinivîsînin gelek in..." Tu caran nivîskarek naxwaze ji pênûsa xwe re sînor û tixûban çêbike. Pênûsa ne azad ne xwediya berhemên azad e. Ji bo ku em berhemên azad biafirînin, pêwîst e em pênûsên xwe ji hemû rengên bend û sînoran rizgar bikin. Ne tenê bi mirovan, her wiha bi pênûsan re jî rizgarkirin gerek e.

Welat xwe nû kir, bû Welatê Me. Baş e. Nivîsên di rojnameyê de azad in. Pênûs serbest dinivîsînin. Nêzîkbûna nivîskaran ji hilbijartina mijaran di cihê xwe de ye. Ez bawer dikim kesek helwesta rojnameyê ya neteweyî şaş nanirxîne. Lewre helwesteke welatparêz e. Ji her welatparêzekî tê xwestin ku piştgiriya vê berhema welatparêz bike.

Di vê nivîsa xwe de ez dixwazim bala redaksiyona Welatê me bikişînim ser kêmasiyekê, dibe ku hinek wê kêmasiyê pêwîst nebînin, lê hema di nêrîna min de kêmasiyeke wisa ye, divê em nivîskarên rojnameyê û bi taybetî redaksiyon li ser rawestin:

– Gelek gotinên erebî di rojnameyê de têne bikaranîn, tevî peydabûna gotinên kurdî beramberî wan wişeyên biyanî. Kesên bi erebî nizanibin, guman dikin ew gotin kurdî ne. Eger em li şûna wan peyvên biyanî yên kurdî (ji soranî, zazakî, hewramî...) bi kar bînin gelekî baş dibe. Gelo "Bêguman" a kurdî ji "Bê şik"a erebî ne ciwantir e.

– Hevalên di redaksiyonê de nivîsaran li gorî devoka xwe ya herêmî sererast (redakte) dikin. Gotinên navçeyî bi kar tînin. Weke: "Vêcar"a me dikin "Vêca", "Vêgav"a me dikin "Vêga", "Nûner" dikin "Qasid, Mebûs"... û hwd. Helbet, di bin navê sererastkirina nivîsê de, guhertina gotinên kurdî bi yên erebî, tirkî ne kiryareke rast e. Hêvîdar im, endamên redaksiyonê vê rexne yan jî pêşniyarê bidin ber çavên xwe. Ne devoka Mêrdînê, Farqînê, Serhedê, em xwerû bi kurdiyeke zelal binivîsînin û nivîsan binirxînin. Bawer dikim heke em di vê çarçoveyê de li nivîsan bimeyzînin, emê rojnameyeke bedewtir pêşkêşî xwendevanên xwe bikin.

Hem em xwendevan û nivîskar, hem jî xebatkarên Welatê Me, ji kerema xwe re, her yek ji aliyê xwe ve rojnameyê ji kêmasiyan biparêzin.

# DAR Û BIVIR

Dar û ber û şînahî
Didin mirov dilşahî

Ku tên payîz û bihar
An jî havîna dijwar

Dibin bixeml û xêlan
Ew hîmî û daristan

Tev vedibin bi harî
Pelkên bi keskê tarî

Ribanek û sipîndar
Darê çam, bî û çinar

Wek qîzên çardeh salî
Nazik û pir delalî

Li ber bayî dihejin
Kul û derdan dikujin

Ji bo me pêdivî ne
Bo jînê çavkanî ne

Welatê bêdaristan
Dibe mîna goristan

Lê rojekê ji rojan
Teqreqê kire olan

Deng dihat ji çar hêla
Dengê bivirên pola

Mîna agir dibirî
Bivirê siqakirî

Êzingfiroşên nezan
Zor didane biviran

Dor giha darek mezin
Pir bigilî û bigazin

Got: "Bivirê ji pola,
Ev çi kar û çi şol e?

Ev hezar sal qediya
Ez mame li ser piya

Tu min halo nebîne
Min çend nifş mirov dîne

Êdî hêsanî nîn e
Tê min bibirî wiha

Çawa ez hezar salî
Û herim bi vî halî?

Lê gazin ji te tune
Destiyê te ji min e

Xwediyê te xwelî li serî
Ew destî ji min birî

Bila destî nebûna
Tu bi serê xwe bûna

Tiştek ji te nedihat
Em nedibûn malmîrat

Wê geş bûna daristan
Rizgar bûya Kurdistan.

**JÎR DILOVAN**

## Ez li benda nameyên we me

Hevalên delal! Bi kurtî be jî, du hefte li ser hev di vê rûpelê de li ser mafên zarokan nivîs derketin. Heftiya paşî jî, Jîr Dilovan ji we re helbestek nivîsand. Jîr Dilovan jî mamosteyekî zarokan e. Car caran ewê ji we re helbest û çîrokên zarokan binivîsîne.

Min heftiya duduyan ji we re gotibû ezê li benda name, çîrok û resimên we bim. Heftiya çûyî, du hevalên we ji min re helbest û resim şandin. Ez vê heftiyê resimê ku Özlem Gezgin (7 salî) çêkiriye û helbesteke din ji mamoste Jîr Dilovan di vê rûpelê de diweşînim.

Hûn jî, ji min re binivîsin. Eger pêşî hûn baş nikaribin bixwînin û binivîsin, bila dê û bavê we an jî bira û xwişkên we, alîkariyê bi we re bikin. Heta heftiyeke din bi xatirê we.

**Mamoste Zozan**




**AGIRÊ DÊRSIM**

Dişewite dişewite
Gundê min dişewite
Agir berdan mala min
Dilê min dişewite

Dîsa roj nû bû
Derdê me jî nû bû
Qîrekê bikin li dinyê
Dinya ji bo çi
Ker û kor û lal bû.

**Özlem Gezgin**

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

### Em li ser xeta berxwedaniyê bimeşin

Ferman ji jor hat dayîn, wezîrê karê hundirîn îşaret da û kontrgerîla jî tatbîq kir; buroyên Özgür Ülke'yê kavil bûn. Stêrkek ji ezman fiştixî (şemitî). Ersin Yıldız, xebatkarê ÖzgürÜlke'yê şehîd ket. 23 xebatkarên rojnameyê birîndar bûn. Hêzên kolonyalîst, bi van kiryarên xwe yên qirêjî kêfxweş bûn. Hindik mabû ku ji kêfan destên xwe hine bikin. Lê belê kêfxweşiya wan pir neajot. Daxwaza wan di dilê wan de, kenê wan di qirika wan de ma. Li ser kavilên buroyên Özgür Ülke'yê, li ser xwîna şehîd û birîndaran, bi baweriyeke mezin xebateke bêhempa û bêkemasî aj da. Bombeyên wan jî bi kêrî tiştekî nehatibûn. Hejmarên Özgür Ülke wek sîleyeke tund li ser rûyê wan teqiya.

Hewce nîn e ku, em li ser domandina jiyana rojnameya Özgür Ülke'yê pir gotinan bibêjin. Bi kurtasî, domandina weşana Özgür Ülke'yê ji bo çapemeniya Kurd êdî bûye meseleya hebûn û tunebûnê. Pêwist e ku, hemû hêzên welatparêz û şoreşger di qada çapemeniyê de dîwarê berxwedanê li dorhêla Özgür Ülke'yê lê bikin. Em bi kêfxweşî dibînin ku, li dû bombekirina buroyên rojnameyê hemû weşanxane, kovar û rojnameyên kurd, ji bo jiyandina Özgür Ülke'yê bi piştgirî û hevkariyeke xurt dixebitin. Daxwaza me ew e ku, ev piştgirî û hevkarî bila di dîroka çapemeniya kurd de rûpeleke nû veke û di qada çapemeniyê de ji bo afirandina yekîtiyê bibe destpêkeke nû.

**Nedim Baran**
**Girtîgeha Bursayê**

### Emê bixwînî û bidin xwendin

Birêz xebatkarên Welatê Me; min dixwest ku ez zûka ve ji were kêfxweşî, dilxweşiyên xwe, bi ronahî û bi spasiyên xwe ve bişînim, lê mixabin heta niha li min neqediya.

Min divê ku ez hinekî li ser rojnameya me ya xwerû bi kurdî bisekinim. Hûn dizanin ku di şoreşa gelekî bindest de rojnameyeke bi zimanê gel pir girîng e. Ez bawer im ku wê Welatê Me vî karî bi cih bîne. Ji qasê ku Welatê Me derdikeve heya niha, du nûçeyan bala min kişandin. Ya yekemîn, bombekirina Özgür Ülkeyê, ya din girtina mebûsên DEP'ê bû. Ez van herdu bûyeran ji protesto dikim. Ez tewra rojnameya Miliyetê ya li ser nûçeya "Helîkopterê PKK'ê li Aspendosê" protesto dikim.

Xwestina min ya herî mezin ew e ku xwendevan Welatê Me bixwînin û bidin xwendin û hînî nivîsandina bi zimanê xwe bibin. Bila ji Welatê Me re nameyan binivîsin. Ji hemû xebatkarên Welatê Me re rojên dilxweşî û serfiraziyê dixwazim. Serkeftin.

**Navxweş Eynê / Ankara**

### Ew li me û gelê me pîroz be

Hevalên hêja! We bi Welat barekî giran girtibû ser xwe. Ji sedemên ku tê zanîn berpirsiyariya we mezin bû. Bi ya min li dijî her celeb kotekî û zehmetiyan we ew berpirsiyariya xwe birûmetî bir serî. Heta hûn ketin dadgehan jî, lê we dev jê berneda. Mixabin tengasiyên aborî nefes li we çikand. Em cardin xwedî li we derneketin. We bersiva xwedînederketina me bi Welatê Me da. Niha em şermezar bin jî, em şa ne. Em şa ne ji bo ku Welatê Me gihîşt me. Ew li me û gelê me pîroz be!

Ez dê ji îro şûn de, li gorî derfetên xwe, çi ji destê min were bi cih bînim. Niha ez ji we re bi dimilkî nivîsekî bi rê dikim. Ew li ser cezakirina nûnerên Kurdan e.

Navê min Mehmed e, lê ez dixwazim yê kurdî bi kar bînim. Ji bo ku dayîk Memo dibêje. Lewma min Memo Darrêz nivîsand. Darrêz cihekî ku biçûktiya min tîne bîra min e. Ji bo vê yekê lê borînê xwe dixwazim. Di derfetekî din de ez dê li ser Darrêz binivîsim.

Silav dikim, di weşana nû de serkeftina we dixwazim.

**Memo Darrêz**



# Ji Welatê Me

Mazhar GÜNBAT

## Bêqerariya dewletê

Gotineke pêşiyan heye; Qerara herî qerab ji bêqerariyê çêtir e. Çi şexs çi jî sazî, dema di warekî de bêqerar ma, tu carî ne mumkun e probleman çareser bike û bi pêş ve here. Van salên dawî rayedarên komara dewleta Tirkiyeyê, di warê kurdî de tam di nav bêqerariyekê de ne. Carinan dibêjin kurdî ziman e, carinan dibêjin ne ziman e. Carinan dibêjin bila ev ziman an jî "neziman" di dibistanan de bê hînkirin, di televizyonan de pê bê axaftin, carinan jî dibêjin, na, kurd ji xwe tunin wê zimanî çi bê hînkirin? Van rojan dîsa serokwezîra Tirkiyeyê û hin rayedarên din dibêjin gerek bi destê dewletê di televizyona GAP'ê de bi kurdî du saet program çêbin. Îhtimal e ku piştî du sê rojên din qerarekę berevajiyê vê dîsa bê standin. Helbet, em tu car hêviya xwe bi qerarên vê dewleta bêqerar ve girênadin. Bikaranîna zimanê kurdî mafê me ye; ew serbest jî bikin qedexe jî bikin, em dev ji vî mafê xwe bernadin.

Lê min xwest ez balê bikişînim ser vê bêîstikrariya dewletê. Esas ne tenê di vî warî de li ser gelek tiştên din vê dewletê ev 70 sal in ji xeynî hovîtiyê tu qerarên bi cesaret nesitandine. Sebebên paşvemayina vê dewletê çi dibin bila bibin, ev rewşa bêqerariyê astengeke mezin e li hember pêşveçûnê.

Bila ew di nav vê erênaya xwe de herin û werin, me bi xwe qerara xwe ji zû ve daye, em zanin em li pey çi ne. Em di riya doza xwe de dimeşin her çendî problem û astengên me hebin jî.

**WELATÊ ME Û FAL**

Gelek xwendevanên me ji bo Welatê Me hebûna "FAL"ê nepêwist dibînin. Dibêjin fal tiştekî pir sivik û ne cidî ye ji bo rojnameyeke mîna Welatê Me. Ez dixwazim pêşî vê bibêjim: Niyeta me tune ku em falê hertim bidin, ew tiştekî wextî ye. Lê gerek e em rewşa zimanê xwe bidin ber çavê xwe. Ji sîh milyon kurdî tenê çend hezarek bi kurdî dixwînin. Em li sebebê nexwendina wê digerin û dixwazin tiştên cur be cur biceribînin. Fal jî yek ji wan e. Di her malikekê de sê cumle (hevok) hene. Kurd di warê xwendina zimanê xwe de pir tembel in. Me got, qet nebe ev tembelê zimanê xwe dikarin du sê cumleyên malikên falê bixwînin û piço piço be jî meyla wan ji xwendinê re çêbe.

Wekî din, kurdî ji alî rêziman, paşpirtik, pêşpirtik, peyv û hwd ve çendî dewlemend be jî, di gelek waran de pê nehatiye nivisandin. Em dixwazin ku di her warî de zimanekî niviskî çêbibe. Wekî ku niha dibistan û akademiyên me tunin, gerek e di vê rojnameyê de em bingeha gelek tiştan deynin. Ji felsefe, kimya , wêje, nûçe şano, sînema, heta bigihîje falê, pêwist e em bingeha zimanê her warî çêbikin.

Ji ber wê yekê, bila kes netirse, em ne ji falê bawer dikin, ne jî niyeta me heye ku wê bi kesên din bidin bawerkirin.

Li ser daxwaza xwendevanên me ji vê heftiyê ve emê di rûpela 15'an de ferhengokekê didin. Li hember peyvên kurdî peyvên di nav parantêzê de yên tirkî ne.


**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Gazete)

Li ser navê ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
Aynur BOZKURT

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
Mazhar GÜNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
Mehmet GEMSİZ

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
Suut KILIÇ

Redaktor
Sami TAN

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî
(Halkla İlişkiler Müdürü)
Sıraç AKSOY

NAVNÎŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
249 13 44 – 245 29 91
ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÛNERÎ
(Temsilcilikler)
Hewlêr– Niwa Hebîb

Suriye– Jan Dost
Fener Rojbiyanî

Berlin– Soliman Sidou
49-30-69 00 26 95

Badenwurttenberg– A. Rahîm Ayaz
4975453258

Hamburg– A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88

Bonn– Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49

Amsterdam– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66

Swed– Amed Tigris
46-8-740 69 81

Hannover– Selîm Biçûk
49-5721-813 60

Munchen– Mahmut Gergerli
49-871-670 884

Atina– Sîrwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905


# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Bersiva wan bi kurdî bidin

Gelî bira û xwişkên hêja û xweştivî! Doh gava ku hejmara Welatê Me ya sisiyan gihîşte min û min zanîbû cara pêşîn ku rojnameya kurdî li Tirkiyeyê vejiyaye, ez ewqas kêfxweş bûm ku perên min hebûna, ezê bifiriyama! Ev têkoşîna we sed caran pîroz be! Niha çend diyar e ku nivîskarên we tecrûbedîtî ne êdî; gelek xeletên rêzimanî ku di rojnameya Welat de hebûn, ji rojnameya Welatê Me winda bûne! Ca xelk dikare rojnameya we bi serfirazî wekî çavkaniyeke ewlekar û cihê bawer bi kar bîne, çi ji bo meseleyên uslûb û çi ji bo meseleyên rêzimên û bikaranîna zimankî. Qasî ji min bê, ezê têkoşim ji bo ku vejîna rojnameya we bidim zanîn li nava xelkê dewletên Rojavayê.

Cihê daxê ye ku pirsgirêkên gelê kurd kêm nîn in. Asteng li ber pêşveçûnê jî kêm nîn in. Her çend em dikarin kurdan pal bidin (teşwîqa wan bikin), her çend em dikarin vê daxwazê di dilê wan de biçînin, ku ew ji dilûcan bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin, emê astenga ji hemûyan mezintir –ya nezaniyê– ji holê rakin. Ev pirsgirêka hanê gelek kevn e li nav kurdan. Di helbestekê ji helbestên Ehmedê Xanî de (ji sedsala hevdehan),"Emîr Meclîsa", ev dibêje:

Teb'–i Xanî sedef e, gewher e, îrfan e welî
Metin xwanek nebitin, sahib–i me'na çi biket?
(Nivîsa Xanî sedef e, cewher e, irfan (ilm) e, lê gava ku xwendevan nebe, nivîskar çi bike?)

Jixwe di kovara Hawarê ku li salên sihan û çilan ên vê sedsala me de derdiket, wisa jî hate gotin:

"Şerma mezin ew e ku mirov nezanê xwendin û nivîsandina zimanê xwe be."

Li pêvajoya salên bên, wê paşeroja gelê kurd –û nemaze paşeroja zimanê kurdî– bête qerardan. Gava ku ez dibînim ku kal û pîr bi hev re bi kurdî xeber didin, lê gava ku gazî kur û neviyên xwe dikin, bi wan re bi tirkî xeber didin, ez bi ber xwe dikevim. Gelo zimanê kurdî bûye zimanê pîr û kalan bi tenê? Gelo zimanê kurdî zimanê rojên qediyayî ye bi tenê? Ev kuştina zimanê me ne bi destê dijminên me ye, sebebkar em in, em! Bi derketina rojnameyeke bi kurdî wekî Welatê Me, derfeteke nû (delîvek, fersendek) di destê me de çêbû, ku em xeletên xwe sererast bikin, ku em zimanê xwe –yê ku hêj nemiriye, yê ku hêj zêndî ye, tevî hemî têkoşînên dijminên me– ji nû ve vejînin. Ezê nameya pîrozbayî ya xwe wisa bînime dawiyê: Heval û hogirên hêja, Welatê Me bixwînin, Welatê Me bidine xwendin bi zarokên xwe û gava ku bapîr û dapîrên we bi tirkî gazî we dikin, tu xwedê, bersiva wan bi kurdî bidin! Hemû karên me, çend biçûk û negirîng xuya bin jî, girîngiya wan heye ji bo paşeroja ziman û çanda me.

Hûn bimînin xweş.

**SELMANÎ**

**Têbinî:** Selmanî Kurdologekî biyan e û li ser zimanên rojhilata navîn pispor e. Ew ji xeynî kurdî 15 zimanên din dizane. **(Welatê Me)**

## Zanebûn nîşana serxwebûnê ye

Hevalên birêz û hêja... Komîteya berpirsiyar a rojnameya me ya hêja Welatê Me, an jî bûka destbihene em gelek pîroz dikin. Wa ye bûk ji zincîr û zîndanan rizgar bûye û xwe daye ber xeml û xêza kurmancî, taca hêviyê di serê xwe de veniştiye.

Bi rastî, berdewamiya bi vê bûka destbihene jî rûmeta me ye û barê her niştimanperwerekî kurd e. Zanebûn, nîşana serxwebûnê ye. Di gava cenga navbera tirk û yewnan de ji Tîşîxof dipirsin, "Bi baweriya te wê tirk bi ser bikevin an yewnan?" Tîşîxof, "Ê zane wê bi ser keve." Dîsa jê re gotin, "Bi baweriya te tirk zana ne an yewnan" wî got, "Kî bi ser keve, ew zana ye." Napoleon jî gotiye, "Ez ji hezar leşkerî û sed tankî natirsim, lê ez ji gotarekê ditirsim." Welatê Me rûmeta me ye.

**M. Hemo**
**Xwediyê Pirtûkxaneya Bedirxan / Heleb**

# FERHENGOK

**Aborî:** Ekonomî
**Bandor:** Hîkarî, tesîr
**Berjewendî:** Menfeet
**Berpirsiyar:** Mesûl
**Beşdarî:** Îştiraq
**Biryar:** Qerar
**Bûyer:** Hedîse, rûdav
**Çapemenî:** Press (basın)
**Çek:** Sîleh
**Dad:** Edalet
**Dadgeh:** Mehkeme
**Dagirker:** Îşgalvan
**Damezirandin:** Avakirin
**Danişîn:** Celse
**Derfet:** Îmkan
**Dijber:** Muhalîf
**Endam:** Aza (üye)
**Gef:** Hereşe, tehdit
**Gel:** Xelk
**Gelemşe:** Gelş, pirsgirêk
**Gemaro:** Abluka, ambargo
**Girîng:** Muhîm
**Kiryar:** Fail
**Komcivîn:** Kongre
**Komar:** Cumhuriyet
**Lijne:** Heyet
**Nediyar:** Meçhûl
**Netewe:** Milet
**Nûner:** Mumesîl
**Ol:** Dîn
**Penaber:** Multecî
**Pergal:** Sazûman, nîzam
**Perwerdehî:** Hêvotin, ders û telîm
**Peywir:** Wezîfe
**Pêşniyar:** Temenî
**Pêwist:** Lazim
**Qonax:** Proses, pêvajo
**Rewşenbîr:** Ronakbîr, munewer
**Rêxistin:** Teşkîlat
**Taybet:** Xisûsî
**Tekoşîn:** Mucadele



www.arsivakurdi.org

LI GORÎ SEROKÊ NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA'YA EDENÊ HASAN KAYA:

# 'EDENE BÛYE WEK BAJAREKÎ KURDISTANÊ'

**"Xelkên me yên ku hatine vir, xwe li hev girtine, taxên ku xwerû kurd in ava kirine. Ji hêla din ve ziman û çanda xwe ji bîr nekirine. Piştî raperîna 84'an mirovên me yên ku serî ji dewletê re dananîne û wezîfeyên xwe yên welatparêziyê anîne cih, bûne hedefên dewletê. Ên ku xaniyên wan, gundên wan, pez û malên wan, zar û zêçên wan hatine şewitandin, ketine ser riya Edenê, Mersînê û hin bajarên din ên Enedolê. Ev potansiyela dînamîk li Çukurovayê jiyaneke nû şanî kurdên ku ji zû ve hatine wan bajaran, da. Gelek xebat û serhildan pêk anîn."**

'Edene îro bûye wek bajarekî Kurdistanê. Ji demên berê ve gelê me ji ber hevkuştinê, pevçûnê, jinrevandinê, xizaniyê, zilm û zora axayan û ya dewleta dagirker ... koçî vê deverê bûye." Ev peyvên jor yên serokê NÇM'ya Edenê Hasan Kaya ne.



Hasan Kaya

Hasan Kaya, li ser guherîna Çukurovayê, bi gotineke din kurdbûyina Çukurovayê û avakirina saziya kurd NÇM'ê gelek tiştên balkêş gotin. Kaya li ser bicihbûna kurdan li Çukurovayê, bi sebeb û zehmetiyên wê nirxandin û pêvajo wiha anî zimên: "Xelkên me yên ku hatine vir, xwe li hev girtine, taxên ku xwerû kurd in ava kirine. Ji hêla din ve ziman û çanda xwe ji bîr nekirine. Piştî raperîna 84'an mirovên me yên ku serî ji dewletê re dananîne û wezîfeyên xwe yên welatparêziyê anîne cih, bûne hedefên dewletê. Ên ku xaniyên wan, gundên wan, pez û malên wan, zar û zêçên wan hatine şewitandin, ketine ser riya Edenê, Mersînê û hin bajarên din ên Enedolê.

### Kurdên Çukurovayê hînî jiyaneke nû dibin

Vê potansiyela dînamîk li Çukurovayê jiyaneke nû şanî kurdên ku ji zû ve hatine wan bajaran, da. Gelek xebat û serhildan pêk anîn."

Hasan Kaya, di navbera rewşa kurdên ku berê hatibûn Çukurovayê û yên piştî 84'an hatine, muqayesakê dike. Li gorî wî, nifşên ku dûvre hatibûn hem li ser yên berê tesîrekê dikin û hem jî bi vê tesîrkirinê, xwe jî diguherînin. Derbarê xebata ku ji aliyê kurdan di warê çandê de li Çukurovayê çêdibe û li ser avakirina NÇM'yê vê dibêje: "Di her warî de îro jî xebat û têkoşîn didomin. Diviya ku di warê çand û hunerê de jî têkoşîneke baş bihata dayîn. Ku bi kurtasî bê gotin ji bo wan sedeman, biryar hate dayîn ku li Edenê jî Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) bê vekirin.



Koma Şitlên azadî

Şaxa Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Edenê di sermaweza 1993'yan de ava bû. Ji pirsa "NÇM çima li Edenê şaxa xwe vekir?", re bersiv gelek in. Bi vebûna şaxa NÇM'ê re, gel bi biran hatin ziyareta me. Gelê me yî ku li vir dijî, pê gelek kêfxweş bû. Bi rastî, li navenda me tu hunermendên ku ji zû ve di warê xwe de dixebitin nîn in. Gelê me bi awayekî zanistî (ilmî) xwe di warê çand û hunerê de, bi pêş ve nebiriye.

Em dixwazin serê xwe bi destê xwe bixurînin. Hem beşa me ya muzîkê, hem ya tiyatroyê û hem jî ya folklorê ji kêsên ku nû dest bi van xebatan kirine, pêk tînin. Em car caran mirovine pispor dibînin da ku ders û kursan bidine me. Lê ji ber ku ev kes ne ji dil û can kar dikin, ev kurs û ders çend meh didomin.

Di warê muzîkê de Koma Rewşen heye, 7-8 kes in. Tembûr, cumbûş, ûd û neyê bi kar tînin. Navê koma tiyatroya me Yekbûn e. Em hêvî dikin ku wê kom heta biharê lîstikekê amade bike. Yekbûn, di şahî û şevên Edenê de gelek skeç pêşkêş kirine.

Bira (beş) folklorê li gorî hêza xwe hem lêkolîn û berhevkirinan dike û hem jî govendên gelêrî hîn dibe. Niha govendên dora Amed û Semsûrê (Adiyemanê) ji aliyê Koma Raperîn ve tên lîstin.

Bira ku em jê pir bihêvî ne ya zarokan e. 40-50 heb zarokên me hene. Dema ku têne navendê çavên wan dibiriqin. Dibistana tirkî ya xwe tînin ber çavên xwe, şad dibin û zêde bala xwe didin xebatên xwe. Navê koma zarokan a muzîkê Şitlên Azadiyê ye. Ev kom ji 18 zarokî pêk tê. Navê ya govendên gelêrî jî Şitlên Raperînê ye. Ew jî 18 kes in. Hin zarok jî li ser sazkirina wêneyan (resiman) disekinin.

Heta ku ji me tê em giraniya xwe didin ser zimên. Jixwe endamên me tev bi kurdî dizanin, lê tê zanîn ku kurdiyeke rast û zelal ji me re divê. Wekî din malbatên endamên me di nava xwe de yekîtiyek çêkirine. Ew jî ji bo dananîn û birêvebirina NÇM'ê dixebitin."

Li ser tewra dewletê ya li hember Navenda Çanda Mezopotaya ya Edenê jî Kaya wiha got:"Piştî vebûna navenda me hêzên dewletê heft caran êrîş anîn ser me. Gelek hevalên me hatin binçavkirin û tade li wankirin. Sê hevalên me çar mehan di girtîgehê de man. Dawî hatin bereatkirin. Sedemên van êrîşan jî, çavtirsandin bû, ji bo ku em pir bi pêş ve neçin. Helbet hinek zirar gihîşte me. Lê ev jî heye, heta ku ji me hat me jî xebata xwe bi pêş ve bir. Divê hîn bêhtir bi pêş ve here."



Koma Rewşen

SUUT KILIÇ